# NÛÇEGIHANIYA ZAYENDA CIVAKÎ

DESTEPIRTÛK

• Çiçek Tahaoğlu • Elif Akgül

bia

Weşanên Weqfa Ragihandinê ya IPSyê

# DESTEPIRTÛKA NÛÇEGIHANIYA ZAYENDA CİVAKÎ

•Çiçek Tahaoğlu •Elif Akgül

**DESTEPIRTÛKA NÛÇEGIHANIYA ZAYENDA CIVAKÎ**

©WEŞANÊN WEQFA RAGIHANDINÊ YA IPSyê

Çapa Yekem: Gulan 2018

**©WEŞANÊN WEQFA RAGIHANDINÊ YA IPSYÊ**
Faik Paşa Yokuşu No: 37/7-8 Kat: 3 34430, Beyoğlu, İstanbul
Tel: +90 212 251 1503
Faks: +90 212 251 1609
E-posta: bia@bianet.org
Malper: www.bianet.org
Sertîfîkaya Weşanxaneyê No: 41308
•
Ev pirtûk bi piştgiriya aborî ya Yekitiya Ewrûpayê Fona Navbeynkar a Ewrûpayê ji bo Demokrasî û Mafên Mirovan ve hatiye çapkirin. Nêrînên li vir hatinê ziman yên Weqfa Ragihandinê ya IPSyê ne. Loma jî bi tu awayekî wek nêrînên Yekitiya Ewrûpayê Fona Navbeynkar a Ewrûpayê ji bo Demokrasî û Mafên Mirovan nayên nirxandin.
•
Sepan û dîzayna pirtûkê: Büşra Erinkurt

Wergêr: Nuri Fırat

Xwendina dawiyê: Ferid Demirel, Murat Bayram

ISBN: 978-605-85516-2-6

Çap û berg: Yaylacılık Matbaacılık Ltd.
Fatih Sanayi Sitesi No. 12/197 Topkapı, İstanbul

Jimara sertîfîkaya çapxaneyê: 11931

# DESTEPIRTÛKA NÛÇEGIHANIYA ZAYENDA CIVAKÎ

•Çiçek Tahaoğlu •Elif Akgül

**Çiçek Tahaoğlu**
Rojnameger e. Ji 2011an vir de li bianetê wek edîtora nûçeyên jin û LGBTIyan dixebite. Li Université Marc Bloch ji beşa Civaknasî mezûn bûye. Ji 2009an heya 2011an li AFPyê wek fixer û wergêr xebitiye. Li Açik Radyoyê bernameya Cadı Postası amade kiriye. 2015an de Xelata Serkeftinê ya Müşerref Hekimoğlu wergirtiye.

**Elif Akgül**
Rojnameger e. Ji 2013an vir de li bianetê wek edîtora nûçeyên azadiya ramanê dixebite. Ji Zaningeha Bilgiyê Beşa Sînema û Televizyonê mezûn bûye. Li İMC TVyê weke nûçegihan xebitiye. Di sala 2017an de Xelata Jûriyê ya Taybet a Metin Göktepe wergirtiye.

# Naverok

Ji Weqfê ........ 6
Pêşgotin: Derheqê Nûçegihaniya Zayenda Civakî ........ 9
Çi pêwistî bi vê destepirtûkê heye? ........ 21
Ev destepirtûk ji bo kê ye? ........ 22
Nûçegihaniya Zayenda Civakî çi ye? ........ 23
Jin û LGBTI+ kengê dibin nûçe? Kengê nabin nûçe? ........ 26
Em çawa dest bi nûçeyan dikin? ........ 28
Têkildariya bi çavkaniyên nûçeyan re ........ 31
14 xalên ji bo nûçeyên ne zayendperest ........ 35
Zimanê nûçeyan ........ 49
Baldariya ji bo hilbijartina dîtbariyên nûçeyan ........ 54
Sernava xwe rast hilbijêre, nêçirvaniya tikan neke ........ 56
Piştî te nûçe nivîsand van pirsan ji xwe bipirse ........ 57
Mînaka nivîsandina nûçeyan ........ 58
Analîzên nûçeyan ........ 63
Ceribandinên ji navenda nûçeyan a bianetê ........ 68

## JI WEQFÊ

*Ev pirtûk wek gavek jiyandina tiştên me xeyal kiriye pêk hatiye.*

*Ji bo xeyalên xwe û xeyalkirinê em ê têkoşîna xwe berdewam bikin.*

Eşkere ye ku tespîtkirin, pênasekirin û bilêvkirina rewşên pirsgirêkan çêdikin gava yekem e. Gava yekem a têkoşîna li hemberî pergala heteroseksist û zayendperestî, bi awayek zelal bilêvkirina hebûna nasnameyên cûrbecûr e. Gava piştî vê bêyî gotina "lê belê" parastina wê rastiyê ye ku ew kesên nasnameya wan a zayendî cida ne an jî mêla wan a ji bo zayendan cida ne bi welatiyên din re xwediyên heman mafan in. Bi kurtasî, ji bo têkoşîna li hemberî vê pirsgirêka sîstematîk, divê rê li ber vê tiştê dîsa neyê vekirin û ev, rêya têkoşînê ye.

Ji bo têkoşîna li hemberî zayendperestiyê, li malê, li dibistanê, li leşkeriyê, li nexweşxaneyê, li amûrên ragihandinê yên girseyî, kurtasî li her derê tiştên pêwîst û stratejiyên baş divê bên plankirin û avakirin. Ji bo heteroseksîzm û zayendperestî dîsa neyê avakirin û her wiha ji bo xwesteka mafên wekhev, medyaya dîtbarî û nivîsî xwedî rolek gelek kritîk in.

Em dikarin mînakek rojane bidin: Di 2018an meha Adarê de, hebûna jinên lîstikvan ên tîyatroyê li Meclîsa Tirkiyeyê hatin sansûrkirin. Li dijî vê, berteka çapameniyê an jî ji bo eşkerekirina vê tiştê hincet û mazeretên çapameniyê nîşan daye, ji bo hebûn û dîtina jinan li ser dîka jiyana civakî xwedî girîngiyek kritîk e. Dema di 2yê Avrêla 2018an de li Meclîsa Tirkiyeyê jinên lîstikvan hatin sansûrkirin, li hemberî vê çalakiya "100 jin 100 replîk" hat lidarxistin û agahdarkirina vê çalakiyê ji bo nûçegihanan deynek bû. Bi xirabî bikaranîna peywirê, tenê bi nûçeyên derew û alîgirî nabe; her wiha neagahdarkirina xwendevanan jî li dijî etîka çapameniyê ye û helwestek alîgir e.

Rêbazeke din a têkoşîna li dijî zayendperestî û heteroseksizmê jî ew e ku, pêşdaraziyên di vê qadê de bi gelemperî tên qebûlkirin divê nerastiya wan bên eşkerekirin. Bingehek kûr a partriarkayê heye û ev hêzê dide hinek grûban. Têkoşîna li dijî heteroseksizmê, ku bingeha wê ya herî xurt partriarka ye, pêvajoyeka zor dirêj e.

Wek akademîsyenekê, dawetên ji çapameniya dîtbarî ji bo min dihatin, ji bo agahdarkirina derheqî zayendperestî û heteroseksizmê zêde bibe min ew dawet qebûl dikirin. Dema min di wan hevpeyvin de dît ku guhertina van pêşdaraziyên bi gelemperî tên qebûlkirin gelek zor e û min ev tişt bi rojnamegerên xwedî niyetên baş re jî jiya. Dixwazim hinek mînak bidim.

Aktîvîstên hevezayend, ji psîkiyatriya sazbûyî dixwazin ku, bi awayek zanistî ji nû ve bê nirxandin ku hevezayendîtî çima wek nexweşî tê qebûlkirin. Di 1973an de Yekitiya Psîkiyatriyê ya Emerîkan (APA), hevzayendiyê ji nav DSMyê derxistiye, ku di DSMyê de nexweşiyê ruhî tên kategorîzekirin. Di çarçoveya nirxandina APAyê de, di Kongreya Tenduristiyê ya Cîhanê ya Gulan 1990an de hatibû lidarxistin de, Rêxistina Tenduristiyê ya Cihanê, hevezayendiyê ji nav Kategorizekirina Nexweşiyên Navnetewi (ICD), ku li Tirkiyeyê jî tê bikaranîn, derxist. Bi kurtasî ev 27 sal in nexweşiyeka bi navê hevezayendî nayê pênasekirin.

Rewş gelek zelal e; hevezayendî nexweşiyek nîn e. Min ji pêşkeşvanê bi min re hevpeyvîn dikir re got ku; “Dema tiştek nexweşî ne be tedawî jî ne pêwîst e, ango tedawiyek veguhêrîner ne pêwîst e û ne etîk e.” Ziman ji bo rastiyan her tim têrê nake. Em gotinên xwe bi mîmîkên xwe jî zexm dikin. Pêşkeşvan, ku ez dizanim niyeta wî ya zexmkirina cudatiyê jî tune, dema axaftina xwe qedand wiha got: “Tedawiya hevezayendiyê nayê zanîn.”

Hevezayendî, nexweşiyek tedawiya wê nayê zanîn nîne, ji ber ku nexweşî nîne tedawiya wê jî tune ye.

Zayendperestî û heteroseksizm bi rêya kenok, wêne û herî zêde jî wek gotin bi rêya ziman dîsa tê avakirin. Bi vê awayê bi sedan salan dibe sedema berdewama pêşdaraziyan û cudatiyên li qadên cûrbecûr bandorê li mirovan dikin.

bianet bi salan in nûçegihaniya zayenda civakî û mafan çêdike. Pirtûka “Nûçegihaniya Jinan” di 2007an de hate amadekirin û di 2012an de hate nûkirin. Cara yekem di 2009an de bianetê dest bi çeteleya tûndiya li dijî jinan kiriye û bi vê awayê tundîya jin her roj dijîn dide dîtin.

bianet, bi destepirtûka Nûçegihaniya Zayenda Civakî ji bo em dîsa li dijî heteroseksîzm û zayendîtiyê zimanê xwe, feraseta xwe li pêş bixin rehberek amade dike. Ev rêber, ji bo nûçegihaniya zayenda civakî û mafan çavkaniyek e ku bi pêşniyaran tijî ye.

Wek Nadire û Ertuğrulî di destpêka pirtûka “Nûçegihaniya Jinan” de anîbûn ziman, Weqfa IPSyê di 1993an de bi xeyalên derveyî medyaya gelemperî jî “pêkan e tişt bên kirin” hatibû sazkirin (Ertuğrul, Füsun, Nadire, Tuğrul, Şahika). Ez bawer dikim ku, pirtûka Nûçegihaniya Zayenda Civakî, ji bo nûçegihaniya mafan wê alîkariyê bide rojnameger û nûnerên medyayê.

Prof Dr. Şahika Yüksel

## PÊŞGOTIN:

## Derheqê Nûçegihaniya Zayenda Civakî

Em wek Tora Ragihandina Serbixwe (BIA), ji 2000ê vir de nûçegihaniyê dikin, li ser vê difikirin û perwerde didin. Loma jî her çi qasî nav lê nehatibe kirin jî em xwe wek "dibistan" dibînin. Di nav salan de me her tim xwe ji nû ve pênase kir û me vê daneheva xwe par ve kir. Perwerdeyên me her tim bûn gavên herî girîng, her wiha pirtûkên me yên di encama vê de derketin holê jî... Me bi rojnamegerên çapameniya herêmî dest bi perwerdeyên xwe kir, me navê wê jî Nûçegihaniya Mafan danî. Em gihîştin nêzî 1500 rojnamegeran, em wek bianet ji wan re bûn qadeka nûçegihaniya mafan. Di dema van perwerdeyan de û di sala 2003an de me pirtûka rêza Destepirtûka Nûçegihan (Medya û Civak, Rojnamegerî û Nûçegihanî, Radyo û Karên Radyoyê, Teknolojiyên Ragihandinê û Medya, Medya, Etîk û Hiqûq), di sala 2007an de jî pirtûka rêza Nûçegihaniya Mafan (Nûçegihaniya Mafên Mirovan, Nûçegihaniya Jinan, Nûçegihaniya Zarokan) çap kir. Ji bo hûn bigihîjin van pirtûkan me li ser înternetê jî weşandin. Me ev pirtûk cara duyem çap kirin. Me pirtûka Nûçegihaniya Jinan wek e-pirtûk bi Îngilîzî jî weşand.

Dema me pedwerdeyên ji bo nûçegihanên medyaya herêmî qedandin, êdî profîla medyaya herêmî û xebatkarên wê gelek guherîbû. Pirtûkên me jî êdî li fakulteyên ragihandinê hatibûn xwendin û ketibûn nava çavkaniyên sereke, hetta wek bi navê pirtûka me ya rêza duyem wane hatibûn dayîn, di plana waneyên de naveroka vê pirtûkê cih girtibû. Lê me dizanîbû ku, li fakulteyên rojnamegeriyê di navbera teorî û pratîkê de qutbûnî heye, bi şêweyek din bibêjin, di navbera gotinên kesên waneyên rexnekirina nûçeyan û pratîka nûçeyan didin de ferq heye. Jixwe kesên akademîsyen, kesên ji pratîkê tên rexne dikin ku ew perwerdeha nûçegihaniyê bi seranser ji nû ve didin

avakirin. Li gorî kesên waneyên nûçegihaniyên didin jî, gotinên kesên rexneya nûçeyan dikin ji ber lezgîniya nûçeyan û hêviya berpirsên nûçeyan, edîtoran, xwediyên medyayan û xwendevanan pêkan nîne bikeve meriyetê. Kesên wisa difikirin "naîf" didîtin. Ji aliyê din ve xwendekar bi kîjan hêjahiyê mezûn dibin bila bibin, dîsa jî rojnamegerên li medyaya gelemperî nikaribûn pêşî li rexneya "ji fakulteyên ragihandinê rojnamegerên nizanin nûçe binivîsînin mezûn dibin" bigirin. Bi vê awayê me di 2008an de dest bi projeya Ji Dibistanê Ber Bi Odeya Nûçeyan kir. Bi vê projeyê me xwest ku berî sektorê de bixebitin em bigihîjin xwendevanên fakulteyên ragihandinê yên dixwazin bibin rojnameger. Armanca me wiha bû: Hûn ne mecbûr in di medyaya gelemperî de bixebitin, lê dema we dest bi xebatê kir jî hûn dikarin nûçegihaniya mafan bikin an jî me xwest ku ji bo inîsiyatîfên wek bianetê cesaret bidin wan kesan, ji bo nûçegihaniya mafan berî her tiştê ew li mafên xwe xwedî derbikevin, nekevin nav xeletiyên medyaya gelemperî yên di nûçegihaniya alternatîf de jî tên dubarekirin, van xwendevanan ji bo nûçegihaniya heyî biguherînin perwerde bikin… Ji bo projeya Ji Dibistanê Ber Bi Odeya Nûçeyan xwendevanên polên 3. û 4. yên ji fakulteyên ragihandinê yên zaningehenên Tirkiyeyê û Qibrisa Bakur serî lê didan. Me di navbera wan de hinek kes hildibijartin û di mehên havînê de ew kesan perwerde kirin. Me 9 salên xwe temam kirin û di 2018an de niyeta me "dalya" bû, lê mixabin em mecbûr man ku perwerdeha 2017an ji ber teşebûsa darbeya 15ê Tîrmehê betal bikin. Lê dîsa jî sala em tê de meha Tîrmehê de me perwerde da, bi vê awayê kesên sala berî mafên wan hebûn tevlî perwerdeha betal bibin tevlî vê perwerdehê bûn û tevî xwendevanên nû di çarçoveya vê projeyê de perwerdeha herî qelebalix pek hat. Me bi vê awayê 10 saliya projeya Ji Dibistanê Ber Bi Odeya Nûçeyan temam kir. Di 10 salan de em gihîştin 317 xwendevan û 150 akademîsyenan. Me pirtûka xwe ya bi navê "Destpêkirina Nûçegihaniyê" di

serê van perwerdehan de, sala 2009an de çap kiribû. Lê ji wê rojê heya niha him rojnamegerî him jî siyaseta Tirkiyeyê gelek guherî. Me jî xwest ku em bersiv bidin pêwîstiyên van guhertinan. Di çarçoveya guhertina lêgerîn û pratîka nûçegihaniya xwe de me atolyeyên xwe jî nû kir. Atolyeyên me di çarçoveya nûçegihaniya ji aliyê teknolojiyên dîjîtal ve hatiye guhertin de hat nûkirin. Her wiha me xwest ku nûçegihaniya me formatên nû yên di çarçoveya nûçegihaniya online û nûçegihaniya pirqad de hatiye avakirin bihewîne. Li aliyê din jî me di çarçoveya mafan de nûçegihaniya / rojnamegeriya aşitiyê pêşxist.

Me hîn pirtûka xwe ya bi navê Destpêkirina Nûçegihaniyê cara duyem çap nekiriye, ku bi vê awayê ev pirtûk guhertin, îmkan û pirsgirêkên nûçegihaniyê yên nû bihewîne. Lê di çarçoveya projek din a bianetê de em bi rojnameger, edîtor, nûnerên rêxistinên mafan û akademîsyenan re hatin cem hev. Em di çarçoveya slogana me ya dema em derketibûn rê me anîbû ziman û parastibû "Ragihandinek din pêkan e" de hatin cem hev û me gavek din avêt. Me li ser rojnamegeriya / nûçegihaniya aşitiyê xebatên atolyeyan pêk anî û li vir îmkan, astengî û çareserîyên nûçegihaniya aşitiyê nirxandin. Van atolyeyan û perwerdehên me yên 16 salan, bi taybetî jî perwerdehên Ji Dibistanê Ber Bi Odeya Nûçeyan gelek tişt bi me da hînkirin. Her wiha ceribandinên rojnamegeriya bianetê jî gelek tişt bi me da hînkirin. Rojnamegeriya bianetê ew e ku, êdî gihîştiye, tenê teorîk nîn e her wiha aliyê aboriyê de dikare xwe berdewam bike, bûye "modelek alternatîf", li ser gelek xebatên akademik hatine çêkirin û nûçegihaniya mafan û aşitiyê bingeh digire. Van xebat û ceribandinan ji bo pirtûkek nû rê nîşanê me dan û me di 2016an de Destepirtûka Nûçegihaniya Aşitiyê çap kir. Wergera Îngilîzî ya vê pirtûkê wek e-pirtûk hat weşandin.

Lê beriya pêvajoya pirtûka niha destên we de ye û pêwîstiya

nivîsandina destepirtûka nûçegihaniya zayenda civakî bibêjim, dixwazim kevanekê vebikim û derheqê lêgerînên me yên ji bo nûçegihaniya alternatîf xalekê bibêjim. Wek edîtora rêza Nûçegihaniya Mafan dema min pêşgotinek nivîsand, min gotibû ku, nûçegihaniya mafan ji bo feraset û pratîka hemû nûçegihaniyan “merhaleyek sereke” ye ku nebe nabe. Ev piştrast bû û wiha difikirim ku “nûçegihaniya mafan” cara yekem di nav nûçegihaniya bianetê de têgîn û teorîze bû û di jiyanê de hat bikaranîn. Ev, ji aliyê din ve, bû mijara perwerdeha rojnamegeriyê ya di fakulteyên ragihandinê yên li Tirkiyeyê de tên dayîn. Her wiha qada wê her çi qasî “medyaya alternatîf” be jî, bû referansek sereke ji bo nûçegihan û nûnerên xwendevanan ên dixwazin nûçegihaniya gelemperî bibe “nûçegihaniyek baş”. Bi vê awayê, nûçegihaniya di lîteratura navnetewî de wek “nûçegihaniya mafên mirovan” tê zanîn, bi pênaskirin û pratîka me pêşket. Di nav nûçegihaniya bianetê de û bi xîreta kesên li ser nûçegihaniyê difikirin û dixebitin çarçove û derdên wê berfireh bû. Di vê navberê de gotin, pratîk û nêzikatiya wê ya ji bo nûçe / nûçegihanî çawa bibe bû rêber. Loma jî, bi awayek zelal, nûçegihaniya mafan tenê binpêkirinên mafên mirovan û bikaranîna mafan nake nûçe û naşopîne. Her wiha hemû nûçeyên wê jin, zarok, tercîhên zayendî, nasnameyên etnîk, olî, mezhebî, çandî, yên ku ji ber van nasnameyên xwe wek “yên din” tên hesibandin ji xwe re bingeh digire. Dema vê dike jî rê li ber binpêkirinên mafan ên nû venake. Bi rastî, nûçegihaniya mafan, heman derdên lêgerînên wek nûçegihaniya mafên mirovan, nûçegihaniya aşitiyê, nûçegihaniya berpirsiyar, nûçegihaniya gel, nûçegihaniya nû, nûçegihaniya danûstendinê tên bi navkirin parve dike. Ev jî ji nerazîbûna nûçegihaniya gelemperî pêk dihat. Loma jî kesên li pey van lêgerînan in bi awayek zelal neyînin ziman jî, bi rastî, nûçegihaniya mafan ji bo kesên dixwazin nûçegihaniyeka baş pêk bînin tiştek nebe nabe ye an jî merhaleyek sereke ye – lewre nûçegihaniya gelemperî bi

form û gotinên xwe rê li ber binpêkirinên mafan vedike. Lê hîn, nûçegihaniya mafan ji bo me derveyî van lêgerînan wateya xwe hebû. Ev jî nûçegihaniya aşitiyê û mafan bû.

Di salên 1970an de di cihana akademîk de behsa têgeha "Nûçegihaniya Aşitiyê" hatibû kirin, di salên 1990an de pratîkên wê derketin holê, di dawiya heman salan de di çarçoveya vê têgînê de li ser rojnamegerî / nûçegihanî wê çawa bibe gelek nîqaşên aktuel û akademîk hatin kirin, li Tirkiyeyê cara yekem yê vê têgînê anî ziman jî BIA bû. Lewre lêgerîna "ragihanek awayek din" û û nûçegihaniya bianetê her tim li ser bingeha aşitiyê bû. Lê li gel vê rastiyê nûçegihaniya aşitiyê bi projeya Ji Dibistanê Ber Bi Odeya Nûçeyan bû mijara perwerdehên me û ji bo vê temam bike BİA, 2015an de dest bi projeyek nûçegihaniya aşitiyê jî kir.

Ev projeya BIAyê ya nû û perwerdehên wê, nûçegihaniya gelemperî hîn kûrtir û ji bingehê ve nîqaş kir. Ango çarçoveya akademik / zanistî ya nûçegihaniya gelemperî, tevî nêzikatî û etîka xwe ya ku mora xwe li nûçegihanî, aborî û siyaseta wê daye hate nîqaş kirin. Loma îdeolojî û bingeha epîstemolojîk ya nûçegihaniya gelemperî jî bi vê awayê bûye mijara nîqaşan. Nêzikatiya projeya BIAyê ya nû û perwerdehên wê ev bû û di vê çarçoveya de, tevî pêşqebûla nûçegihaniya mafan nebe nabe, pênasa nûçegihaniya aşitiyê berfireh kir. Destepirtûka Nûçegihaniya Aşitiyê jî mifteha nûçegihaniya gelemperî wê çawa bê guhertin da me. Her wiha tenê ev jî na, nûçegihaniya aşitiyê û nûçegihaniya mafan têkildar kir û di vê çarçoveyê de rêzik û rêgezên gelemperî yên nûçegihaniya gelemperî ji xwe re bingeh digire û etîka ji bo pratîkkirina van rêzik û rêgezan çarçove datîne rexne kir. Bi nêzikatiyek teorîk a wiha ev pirtûk hate amadekirin.

Bi kurtasî, em wek BIA ji bo navê tiştên me kiriye em dibêjin

“nûçegihaniya aşitiyê û mafan”. Em bi vê awayê dibêjin ku, parastina mafan û aşitiyê ji hev qut nîn e û bê hev nabe, nûçegihaniya me xwedî tercîha vê etîk û siyasetê ye. Ev tercîh jî tenê ji bo hebûna dema şerên germ nîn e, her wiha di jiyana rojane de ji bo her rewşên ku rê li ber zêdebûna an jî şikestiyan vedike û bi vê awayê dibe mijara nûçeyan jî ev tercîh heye. Loma nûçegihaniya em tînin ziman, xwe berpirsiyar dibîne ku bila her nerazîbûn û pevçûn (çînî, etnîkî, çandî, zayendî û hwd.) negihijin merhaleya şer bên çareserkin û her wiha aşitiyê pêvajoyek divê her tim pêş ve biçe qebûl dike.

6 sal berî me destepirtûka Nûçegihaniya Aşitiyê, 11 sal berî çapa yekem a pirtûka Nûçegihaniya Jinan û 6 sal berî jî çapa duyem a wê çap kiribû, lê niha çima em êja jî bi Destepirtûka Nûçegihaniya Zayenda Civakî bi we re ne?

Berî her tiştê, di pirtûka me ya Nûçegihaniya Jinan de me eşkere kiri bû ku, jin bi tera xwe di nûçeyan de nayên temsîlkirin, dema tên temsîlkirin jî rastê binpêkirina mafan tên, zimanê jiyana rojane ya di nûçeyan de dîsa tê avakirin fallogo-navendî ye û jinan wek “yên din” dihesibîne. Dîsa berî her tiştê, me gotibû ku, ez ziman, bi rûdana xwe ya nav pergala / gotina rastiya serdest û bi tarîfên kodên nûçeyê bi xwe dike nûçe, nûçeyê dike wek çîrokek mêr û divê ev bên seresart kirin. Ango me gotibû ku, ji bo veguherînê divê ji ziman destpê bikin, vê navberê de rêgez û kodên nûçegihaniya gelemperî, a herî girîng jî etîka nûçegihaniya gelemperî jê bingeh digire divê bê lêpirsîn. Di Destepirtûka Nûçegihaniya Aşitiyê de jî, me gotibû ku, jin tenê di nav zimanê fallogo-navendî de (wek ji nîşankirina xwe jî bê par e) wek “yên din” nayê hesibandin, hemû yên wek “yên din” têne hesibandin jî wek jin tên hesibandin û nêzikatiya li hemberî jinan ji bo wan jî tê revakirin. Hîn rastir jî, dijraberiya jin-mêr a cîhana fikr û ramanê me avakiriye, ketiye şûna dijraberiya arketîpîk a hemû dijraberî li ser hatine avakirin. Loma

me balkişandibû ser vê tiştê: ji bo lêpirsîna cihê vê epîstomolojiyê, raman / çalakî û etîka femînîst pêwîst e. Ango nûçe ji bo jinan û “yên din” ku wek jin hatine hesibandin bê çêkirin. Ji bo ev bibe jî, li pey nûçegihaniyek çawa divê em biçin me ev tespît anîbûn ziman: Divê nav dijraberiyan de pêş ve neçe, divê ji navhevbûna dijraberiyan agahdar be, divê di çarçoveyê de gotina xwe ava bike. Dîsa tiştên em bi gelemperî dizanin, yên wek çi dibe nûçe an nabe nûçe, kîjan çavkanî bê bikaranîn an jî çawa bê bikaranîn, nûçe çawa tê nivîsandin, nirxên edîtoryalî çawa nû ve bê nirxandin, ev tiştan divê bên veguherîn û li pey nûçegihaniyek pêşve diçe biçin.

Bi awayek din, şerta yekem ev bû ku, ziman û gotina ji zilamê heteroseksuelê “spî” bingeh girtiye û jinan wek “yên din”, “yên din” jî wek jin dihesibîne divê ji holê rabibe. Lê ev ne bes bû. Dihat vê wateyê ku, ev jî, çi nav li lêgerîna nûçegihaniya / rojnamegeriya nû lê dikin bila bikin, divê her tim gorî zayendîtî bê kirin. Lêgerîna BİAyê ya bi slogana “ragihandinek din pêkan e” jî di vê çarçoveyê de bû û tenê ji bo nîvê civakê heke wek “yên din” neyê hesibandin alîkarî dide aşitiya civakî na, bi vê re, heke nûçegihanî di çarçoveya nûçegihaniya aşitiyê de bê avakirin, jixwe nûçegihaniya zayenda civakî û nûçegihaniya jinan tê avakirin, ev jî tê wateya “nûçegihaniya aşitiyê û mafan”. Nûçegihaniya BİAyê gihîştibû vê merheleyê. Wek mînak, heke çavkaniyên nûçeyan tenê ji otorîteyên fermî pêk neyê, heke guh bide kesên dengên wan dernakeve, jixwe deng û çîroka jinan ku ên jiyana rojane de aşitiyê dihûnin jî tê bîhîstin.

Li aliyê din, me navê pirtûka duyem a rêza Nûçegihaniya Mafan wek Nûçegihaniya Jinan danîbû, ne wek Nûçegihaniya Zayenda Civakî, ev tercîhek “etîk û siyasî” bû. Lewre, wek me li jor jî gotibû, jin(bûyî), li ser arketîpîkek “yên din” tê avakirin û hemû “yên din” jî li ser vê arketîpîkê tên avakirin. Di nav vê honaka hegemonîk de jî, tenê jin wek “yên din” nayê hesiban-

din, hemû “yên din” wek jin têne hesibandin. Dema “yên din” wek jin tên hesibandin jî binpêkirinên bi nûçeyan re derdikevin holê hîn zêdetir dibin. Wek mînak, di nûçeyan de ji ber tercîha xwe ya zayendî zilamek “wek jin be”, vî kesê dikir sûcdarek potansiyel an jî “tercîha jinbûnê” kuştin û tundiyê rewa dikir. Gorî daneyek jî, wek mînak, li Tirkiyeyê kesên ji ber sûcê nefretê tên kuştin, trans-mêr nîn in, trans-jin in.[1] Di navbera 2002an û 2012an de (heya çapa duyem a pirtûka me hate çapkirin), di navbera van deh salan de, li Tirkiyeyê 12.343 jin hatin kuştin – ku cûreyên tundiyê yên din derveyî vê ye.[2] Gorî nûçeyên bianetê ji rojnameyên herêmî û netewî, ji malperên nûçeyan, ji ajansên nûçeyan ber hev kiriye, zilaman di 2017an de herî kêm 290 jin, 22 zarok û 34 mêr, ên dema bûyerê li cem jinan bûne an jî xwestine kuştinê asteng bikin, kuştine; tecawizê 101 jinan kirine; tacizê 247 jinan kirine; li dijî 376 zarokên keç îstîsmara zayendî pêk anîne; 417 jinan jî birîndar kirine.[3]

Ev Destepirtûka Nûçegihaniya Zayenda Civakî, him berdewama pirtûka me ya Nûçegihaniya Jinan ya ji nû ve hatiye nirxandin, him jî wek rêberekê ye. Vê carê tenê bi jinan bisînor nema, baldikişîne ser binpêkirinên di nûçeyên derheqê LGBTI+yan jî û her wiha di çarçoveya ceribandinên bianet û KaosGLyê de rehberek pêşkêş dike, ku ceribandinên bianet û KaosGL nîşan didin ku kesên xwedî tercîh û nasnameyên cinsî û zayendiyê yên cuda û cûrbecûr wê çawa bibin mijara nûçegihaniya mafan.

Wek pirtûkên me yên berî ev pirtûka me jî di encama projeyek de derket holê. Projeya me ya bi navê Nûçegihaniya Zayenda Civakî, di 2016-2017an de bi KaosGL re pêk hat, ku KaosGL derheqê nûçegihanî û kovariya LGBTI+ de xwedî ceribandinek

1 http://t24.com.tr/haber/turkiye-trans-cinayetlerinde-avrupa-birincisi,290276
2 http://www.dogrulukpayi.com/beyanat/54e44aa24f8cc
3 http://bianet.org/bianet/erkek-siddeti/194755-erkek-siddetinin-2017-grafigi

girîng e. Di çarçoveya projeyê de, li Stenbol, Mêrsîn, Bursa, Izmîr, Eskişehir, Trabzon, Amed, Muğla, Edirne û Dêrsimê 10 xebatên atolyeyê pêk hat. Di van atolyeyan de nûnerên rêxistinên herêmî yên jin û LGBTIyan, rojnameger, akademîsyen û xwendevanên fakulteyên ragihandinê hatin cem hev.

Wek di xebatên me yên atolyeyên din de jî bû, di van atolyeyên me de jî hînkirina bi hev re çêbû û me xwest ku tiştên di vê pêvajoyê de derketine holê bi rêya vê pirtûkê bi we re parve bikin.

Prof. Dr. Sevda Alankuş

## DI HEQÊ PROJEYÊ DE

Me Destepirtûka Nûçegihaniya Zayenda Civakî ya ji bi piştgiriya Yekitiya Ewrûpayê Fona Navbeynkar a Ewrûpayê ji bo Demokrasî û Mafên Mirovan ve hatiye amedekirin û Projeya Pirtûkxaneya Online di navbera salên 2016-2018an de bi rêve bir. Supervîzora projeyê Prof. Dr. Sevda Alankuş, koordînatorê wê jî Öznur Subaşı bû.

Ji bo piştgiriya naverokên atolyeyan a di çarçoveya projeyê ve hatine rêvebirin, erkedara hîndekariyê ya Fakulteya Ragihandinê ya Zaningeha Galatasarayê Doç. Dr. İdil Engindeniz, Gulana 2016an de 80 hêjmarên 11 rojnameyên gelemperî / netewî (Hürriyet, Sabah, Posta, Sözcü, Habertürk, Yeni Şafak, Cumhuriyet, Aydınlık, Birgün, Özgür Gündem, Yeni Akit) û 9 rojnameyên herêmî (Karadeniz, Yeni Asır, 5 Ocak, Özgür Haber, Çağdaş, Pusula, Güneydoğu Ekspres, Olay, Sakarya) lêkola. Her wiha gorî pîvanên nûçegihaniya zayenda civakî 544 nûçeyên 7 televîzyonan jî lêkoliya û bi giştî 6568 nûçê lêkoliya û raporek amade kir.

Di çarçoveya projeya du salan berdewam kir de, bi esasî, ji bo veguherîna gotin û pratîkên rojnamegeriya xwedî pêşdaraziyên zayendperestî yên medyaya gelemperî û herêmî, rê û amûr hatin nîqaşkirin. Ji bo vê armancê me bi komeleya KaosGL re li Tirkiyeyê li 11 navendan atolyeyên nûçeyan lidarxist. Di atolyeyên me yên li Stenbol, Mêrsîn, Bursa, Izmîr, Eskişehir, Trabzon, Amed, Muğla, Edirne û Dêrsimê lidarxist de nûnerên rêxistinên LGBTI û jinan û rojnameger hatin cem hev. Di van atolyeyan de pratîka mêr a nûçegihanî, pirsgirêk û çareseriya wan a medyayê de cih digire hate nîqaşkirin. Her wiha nûçegihaniya zayenda civakî çi tê femkirin û ev çawa pêk tê jî hate nîqaşkirin. Erkedara hîndekariyê ya Fakulteya Ragihandinê ya Zaningeha Galatasaray Doç. Dr. İdil Engindeniz, erkedara hîn-

dekariyê ya Zaningeha Kadir Has Prof. Dr. Sevda Alankuş, endamên komeleya KaosGL Ali Erol û Yıldız Tar, edîtora azadiya ramanê yê bianetê Elif Akgül û hev-gerînendeyê giştî yê bianetê Haluk Kalafat, di atolyeyên nûçeyan de li ser nûçegihaniya jinan û nûçegihaniya lgbtiyê axifîn. Atolyeyên di navbera Cotmeh 2016-2017an de hatin lidarxistin de 269 rojnameger, nûnerên rêxistinên civakî, xwendevanên fakulteyên ragihandinê û erkedarên hîndekariyê hatin cem hev. Li civînên maseya gilover de li ser encamên atolyeyan hate axaftin û bi vê awayê naveroka Destepirtûka Nûçegihaniya Zayenda Civakî û pirtûkxaneya online hate xurtkirin. Destepirtûka Nûçegihaniya Zayenda Civakî ji aliyê edîtorên bianetê Elif Akgül û Çiçek Tahaoğlu ve hate amadekirin. Işın Elçin, edîtora Pirtûkxaneya Online ya Nûçegihaniya Zayenda Civakî bû. Her dawî di çarçoveya projeyê de wê Konferansa Nûçegihaniya Zayenda Civakî bê darxist.

Hemû nivîs û sernavên nûçeyên di vê pirtûkê de çavkaniyên wan nehatiye diyarkirin, ji nûçeyên medyaya gelemperî hatine girtin. Ji ber ku ev nûçe, newekheviyên zayendî nû ve ava dikin û bi vê awayê pirsgirêkek sîstematîk nîşan didin, me nexwest cih bidin navê saziyên medyayê yên ev nûçe weşandine.

## Çi pêwîstî bi vê destepirtûkê heye?

Dema nûçeyek qezayê bixwînin zayenda şofêr kengî tê diyarkirin? Dema di nûçeyek derheqê îstîsmara zarokan de jina "dayik" di sernavê / manşetê de wek "cinawir" tê diyarkirin, çima bi tu awayî behsa "bav" nayê kirin?

Çima LGBTI+yan* di nûçeyan de tenê wek "mexdûr" an jî bi "jiyana rengîn" cih digirin? Nûçegihanek, dema di nûçeya xwe cih dide trans-jin/mêrek, çima xwe wiha dihesibîne ku navên wan ji wan baştir dizane?

Jin çima 8 Adarê de li manşetan, 9 Adarê de jî li rûperal 3. de cih digirin? Çima nûçeyan de endezyarên nêrînên wan cih digirin hemû zilam in û kesên diyetisyen jin in?

Nûçeyek derheqê tûndiya zayendî, heke bi hemû kûrahiya xwe neyê gotin nabe nûçe? Ji bo "nûçe were xwendin" dev ji çi tê berdan?

Pêkan e ku, mirov dikare van pirsan ji bo bultenên nûçeyan ên her seatê di televîzyonan de cih digirin, ji bo malperên nûçeyan ên qasî "tik"ek ji me dûr in, ji bo hemû nûçeyên rojnameyan ên xwedî ramanên çep û rast bipirse.

Li dijî nûçegihaniyek ku di texta nûçeyek xwedî hezar tîp de jî newekhevî avadike, bi vê rehberê me xwest em nîşan bidin ku nûçegihaniyek li hemberî wekheviya zayenda civakî xwedî baldar e pekan e.

* LGBTI+: Ev peyv ji bo kesên lezbiyen, gey, biseksûel, trans û interseks tê bikaranîn û danîşana "+" jî ji bo hewandina hemû tercîh û nasnameyên cinsî û zayendî lê hatiye zêdekirin. Her wiha nayê xwestin ku kes li derve bimîne û jê re nasname bê diyarkirin, tê xwestin ku hişmendiya bi vê awayê bibe civakî.

## Ev destepirtûk ji bo kê ye?

Di serî de ji bo rojnamegeran. Ji bo nûçegihan, kameraman, wênekeş, edîtor, edîtorên rûpelan, gerînendeyên karên nivîsan, gerînendeyên giştî yên weşanê û hemû xebatkarên medyayê.

Heman demê de ji bo xwendevanên ragihandinê û akademîsyenan yên ku dixwazin qalibên ji bo nûçeyan gelemperî tên bikaranîn û loma jî nayên lêpirsîn sererast bikin, tiştên hîn berî nehatine vekolandin vebikolin û bi vê awayê hîn bibin.

Her wiha ev destepirtûk ji bo kesên nûçeyan dixwînin û temaşe dikin.

## Nûçegihaniya Zayenda Civakî çi ye?

Nûçegihaniya zayenda civakî jî, perçeyek nûçegihaniya mafan a wek tercîhek siyasî û etîk e. Di nûçegihaniya mafan de ji bo bibin mijara nûçeyan kesên "yên din" tên hesibandin ne pewîst e bibin faîl an jî kirdeyên binpêkirinek. Di nûçeyan de pêşî li binpêkirinên nû nayê vekirin û ji bo newekheviyan û çareseriya wan bal tê kişandin. Di nûçegihaniya zayenda civakî de nûçegihaniya mafan wek perçeyek tercîhên siyasî û etîk e.

Dema ku em dibêjin nûçegihaniya zayenda civakî, em tenê nûçeyên tê de "jin" an jî "LGBTI+" cih digirin an jî nûçeyên ji aliyê jin/LGBTI+yan ve hatine nivîsandin nahesibînin.

Li hemberî nêzikatiya nûçegihaniya ku tenê bi mijarên têkildarên wan cih dide jinan û naxwaze LGBTI+yan bibîne, em hewl didin ku di her nûçeyên me de jin û LGBTI+ bibin bingeh, zimanek vebêjiya nêr hildiweşîne bi kar bînin û li dijî gotina nûçeyan a çapameniya gelemperî (serwer) alternatîfek ava bikin.

Loma dema em dibêjin "nûçegihaniya zayenda civakî", behsa vê nûçegihaniyê dikin;

- Wekheviya zayendî dihewîne,
- Der heqî jin û LGBTI+yan de agahdar dike
- Mafên hatine binpêkirin û bidestxistin dişopîne û zelal nîşan dide,
- Xwesteka mafan radigihîne û dema vê dike jî nabe sedema binpêkirinên mafan ên nû,
- Ji cudatîkirinê dûr disekine

Bi kurtasî, em vê nûçegihaniyê diparêzin: Newekheviyan nû ve çênake, bi bîr tîne ku civak tenê ji mêran çênebûye û ne kulubek hetero ye, wek rastiyek qebûl dike ku her geşedanî an jî bûyer bi heman awayê li ser jin û LGBTI+yan jî bandor dike.

## Di nûçegihaniya mafan de girîngiya şopandina fikir

Aliyek nûçegihaniya mafan nivîsandina binpêkirinên mafan û şopandina pêvajoya wê ye, aliyek din jî xûyakirina têkoşînên li dijî van binpêkirinan û destkeftiyên wan in. Peyketina binpêkirinan, çi çawa xeterî hatiye kirin û bi rastî wê çawa bê kirin, bi nêrîna rojnamegeriyê pirskirina bersiyaran û lêpirsîna wan, şopandina destkeftiyan.

Ji bîr neke ku, piştî te binpêkirinek kir nûçe û di pêvajoya çareseriya pirsgirêka te da xuyakirin de jî dibe ku binpêkirinên cuda bên jiyandin. Her çi qasî nûçeya te rojev diyar kiribe jî, zêde baweriya xwe bi baldariya raya giştî ya demborî neyîne û dev ji şopandinê bernede.

Piştî weşandina nûçeya xwe pêvajoyên lêpirsîn, teqîbat û darizandinê jî bişopîne. Têkoşîna hiqûqî bi awayek zelal û agahdarî bike nûçe.

Qasî binpêkirinan têkoşîn û destkeftiyan jî bide xuyakirin.

## Di nûçeyên binpêkirinên mafan de 3Ç+3K

Di nûçegihaniyê de 3Ç+3K rêzikek herî zêde tê zanîn e. Ango pirsên “Çi”, “Çima”, “Çawa”, “Kengê”, “(Li) Ku Derê” û “Kî” tên pirsîn û wiha nûçe tê temamkirin.

Carna ev pirsan ji bo femkirin û nîşankirina bûyerê têrê nakin, pêwîst e ku hîn zêdetir pirs bên pirsîn û bersivên wan bên dayîn. Carna jî nivîsandina hemû ûnsûran dibe ku rê li ber encamên nayên telafîkirin vebike. Dema navê kesek a/ê ji ber tercîha zayendiya xwe naxwaze navê xwe eşkere bike bê nivîsandin an

jî dema nûçeya tûndiya mêr tê çêkirin navnîşana stargehê bê eşkerekirin, wek prensîp, gorî rêzikên 3Ç+3K "rast" e, lê dibe ku ev di pratîkê de rê li ber binpêkirinên gelek ciddî vebike.

Dema nûçeyên tûndiyê çêdikî, ji bo ewlehiya kirdeyên nûçeyê û xizmên wan tu dikarî di nûçeyê de cih nedî hinek tiştan.

Beriya bikaranîna detayên wek fotograf û nav, teqez bi çavkaniyê/a xwe re biaxife. Beriya agahiyek taybet a têkildarî bûyerê binivîsînî, heseb bike ku nivîsandina vê agahiyê ji bo kesên piştî tûndiyê hîn dijîn wê çawa encam bide. Derveyî kesên piştî tûndiyê hîn dijîn, dibe ku tu derheqê mirinê de nûçe çêbikî, di vê rewşê de jî pêwîst e ku ji bo xizm û hezkiriyê kesê/a hatiye kuştin binpêkirinên mafan û travma çênebin tu bi baldar bî.

Dikarî agahiyên wek nav, temen û bajar ê kesê/a tu pê re axifiyî biguherînî. Nav Ayşe ye an jî Zeynep e, ne girîng e, ji bo rastiyên behsa wan di nûçeyê de tê kirin.


Loma rîskan binirxîne, ji bo parastina mahremiyetê carna dikarî rêzikan nerm bikî.

## Jin û LGBTI+ kengê dibin nûçe? Kengê nabin nûçe?

Jin û LGBTI+ dema rolên di civakê de ji bo wan hatine diyarkirin bînin cih an jî neyînin cih dibin nûçe. Bê vê di text û dîtbariyên medyaya gelemperî de tu awayê cih nadin wan.

Dayîkên di nûceyan de cih digirin an “dayikên super” an jî “dayikên cinawir” in. LGBTI+ jî an “mexdûr” an jî “kêfxweş” in.

Yên 8ê Adarê dibin nûçe 9ê Adarê de di bultenan de cih nagirin. Mîkrofonên ji bo rûpelên jiyan, moda û hunerê dirêjê jin û LGBTI+yan dibin, di nûçeyên siyaset, spor û aboriyê de winda dibin.





*Hêjmara rojnamegerên jin ên di kunyeya 6 rojnameyên netewî de cih digirtin, di 2005an de jî,*
**%18.95**
*bû.*


**+**

*2014en de bû*
**%19**


*Ango çapameniya nivîskî di neh salan de ji bo wekheviya zayendî tenê*
**% 0,05**
*peş ve çû.*



*Di çapameniye nivîskî de ji edîtoran*
**%26**
*jin*
**%74**
*mêr in*




**%39,5**
*jin*
**%60,5**
*mêr in*




*Di malperên nûçeyan de hinek din em nêzikî wekheviyê dibin:*
*ji edîtoran* **% 53,4** *mêr,* **% 46,6** *jin.*

**(2014)**

Tunebûna jinan li navenda nûçeyan ku wek kulubên zilaman dişixulin, bandora xwe li nûçeyan jî dike. Navendên nûçeyan ên ji pirsgirêkên jin û LGBTI+yan bêxeber in, van nûçeyan jî nabînin.

Lê dema temsîliyeta jinan li navenda nûçeyan zêde dibe, bûyerên wek nûçe tên hesîbandin, zimanê nûçeyan, hetta girseya xwendevanan, gelek tişt ji mêrbûnê dûr dikeve û aliyê hewandina civakî de hîn berfirehtir dibe.

## Em çawa dest bi nûçeyan dikin?

### Hilbijartina Nûçeyan

Dema tu nûçeyek çêdikî, berê ji xwe bipirse, "Ez vê nûçeyê çima çêdikim?"

Di vê nûçeyê de tiştên baldikişîne çi ne? Çima raya giştî eleqedar dike? Ev nûçe zêde "tik" digire loma çêdikî? Girîngiya vê nûçeyê çi ye? Nûçe wê bibe sedema encamên çawa? Dema nûçe hate weşandin, ihtîmal heye ku ewlehiya can û ruhî ya kirdeyê/a nûçeyê an jî yekê/a din bê tehdîtkirin, wê rê li ber rewşek wisa vebike? Di pêvajoyê de binpêkirin çêbûne? Mijar bi qada erka kî re têkildar e û van kes an jî saziyan berpirsiyarên xwe çawa anîne cih, çawa sepanê wan çibûne?

Van pirsan ji bo navenda nûceyê herî rast diyar bikî ji xwe dipirsî. Dev ji nivîsandina nûçeyê bernede. Magazîn, spor, aborî, siyaset, çi dibe bila bibe, tu dikarî ji her bûyerê nûçeyek zayenda civakî çêbikî. Carna jî tu dikarî bi nûçeya xwe, gotin û çîroka nûçeya di medyaya gelemperî de cih girtiye biguherînî.

Herkes dikare rê û rêbaza parastina xwe ji bo seksê ya hunermendek bi sernava "ŞOK ŞOK ŞOK" bide. Tu jî dikarî heman nûçeyê bikûrayî çêbikî û him bala "temaşevanên giştî" bikişînî him jî derheqê rê û rêbazên parastanê û gihîştina wan agahî bidî.

Gelek tiştên tu her roj diceribînî, dibînî û ser re derbas dibî, asayî û rûtîn dihesibînî û loma bala te nakişîne dibe ku ji bo nûçeyan xwedî qîmet in. Carna dibe ku tu ji xwe bipirsî "Ez çima vê nûçeyê çênakim?" Bi vê nêzikatiyê mijarên tên gotin

ku "Ji wan jî nûçe derdikeve?" dîsa binirxîne û bîne ber çavên xwe.

**Wek mînak, odeyên bo guhertina potikan ên li qadên kamûyê taybetî ji bo jinan in û ev çi qasî asayî tê dîtin, ne wisa? Ev rewş, dibe ku hêjmara bavên zarokên xwe xwedî dikin kêm bike an jî hêjmara bavên zarokên xwe xwedî dikin û dixwazin dema xwe li derve derbas bikin kêm dike.**

**Dema tu nûçeya xwe dihûnî derbikeve derveyî qaliban. Klîşeyan nû ve bi kar neyîne, xwendevanên xwe bi nêzikatî û nêrînên nû re bide nasîn.**

## Hilbijartina çavkaniyên nûçeyan

Dema hilbijartina çavkaniyên nûçeyan girîngî bide temsîliyetê. Dema li televîzyon û rojnameyan dinêrî, tu hemû zilaman dibînî, ne wisa? Bi taybetî jî "qadên ciddî" yên wek rûpelên aborî, spor, siyaset, ji bo "zilamên ciddî" hatine veqetandin.

Ji bo vê newekheviyê veguherî, mîkrofona xwe dirêjê jin û LGBTI+yan bike. Ji bîr neke ku, pirsporên her tiştî zilam (spî, heteroseksuel û normên civakî yên din temsîl dike) nîne. Jin û LGBTI+ yên di her qadên de pirspor jî hene.

Jin û LGBTI+ yên ji bo pirsporî û nêrîna wan te serî lê daye, ji ber ku mîrateyên wan ên çandî û ceribandinên wan ên civakî ji profîla pirsporên di medyayê de xuyayî ne cuda ye, ew dikarin ku ji bo nûçeyan nêrînên cuda û perspektîfên nû pêşkêş bikin.

Tu ne mecbûr î ji bo qadên jin û zilaman re ji aliyê nêrîna kevneşopî ve hatiye diyarkirin xwe bi sînor bikî. Tu dikarî mijarên wek xwedîkirina zarokan û karên malê bi zilaman re, siyaseta ewlehiyê û sporê an jî aboriyê bi jinan re biaxifî.



*Ji pirsporên di nûçeyan de nêrînên xwe tînin ziman*

**%81** *zilam*
**%19** *jin in*



*Ji kesên di nûçeyên siyasetê de dibin mijar tenê*

**%16** *jin in*



*Hêjmara jinan a di nûçeyên aboriyê jî*

**%21 e**

Ji ber ku zilam di her mijarê de xuyakirî nin, tu bi hêsanî dikarî bigihijî zilamek pirspor, telefonên wan bidest bixî, nêrînên wan bigirî, lê heman tişt ji bo pirsporên jin û LGBTI+yan ne hêsan e. Lê dîsa jî tu bi heterî tev bigere, dev jê bernede. Dibe ku hinek zêde dema te bigire lê tu dikarî kesek derveyî zilamên her tim xwedî gotin in bibînî.
Carna dema te kesek jin û LGBTI+ nedît, ew bixwe jî dibe bibe mijara nûçeyê. Dema tu di perspektîfa nûçegihaniya zayenda civakî de dinêrî, kêmasiyên tu dibînî di nûçeya xwe de bîne ziman, ew alîkarî dide ku newekhevî bê xuyakirin.

Tu dikarî wiha bal bikişînî ser vê newekheviyê:

- Di nav desteya daxuyanî da çapameniyê de tu jinek cih negirtibû.
- Kesên xelat wergirtin hemû zilam bûn.
- Desteya wezîran ji 24 zilam û 2 jinan pêk hat. Desteya wezîran a berî ji 25 zilam û jinek pêk hatibû.

## Têkildariya bi çavkaniyên nûçeyan re

### Têkildariya bi civaka sivîl û kirdeyên nûçeyan re

Dema tu derheqê mijarek de nûçe çêdikî, kesên tu nêrînên wan digirî bila tenê kesên her tim di medyayê de cih digirin û bi hêsanî tu dikarî bigihijî wan nebin, tu dikarî bi rêxistinên mafan re jî bikevî nav têkiliyan û nûçeya xwe gorî nêrîna nûçegihaniya mafan çêbikî.

Bi kê re û çawa tu bikevî nav têkiliyan? Kîjan rêxistin li ser kîjan mijarê dixebite hîn bibe û wisa destpê bike. Agahiyên pêwîst gelek caran li ser malperên wan û nûçeyên derheqên wan de cih digirin. Dema tu lêkolîna ewil nekî û tu wisa bikevî nav têkiliya, him dema te him jî dema kesên tu dixwazî têkildar bibî vala derbas dibe.

Kes an jî saziya tu têkildar bûyî, dibe ku rêxistinek navnetewî be, komeleyek gelek tê zanîn an jî ya taxek be, kulubek zaningehê an jî ya xwendevanên lîseyê be. Bi hemûyan re bikeve nav têkiliyek profesyonel û wekhev. Wek mînak, dema li beşek Netewên Yekbûyî geriyayî tu çawa xitap dikî, dema tu li Komeleya Piştevaniyê ya Nabosa Şaşıfelekê geriyayî jî bi heman ciddiyetê bikeve nava têkiliyê.

Rêxistinên Civaka Sivîl, bi gelemperî navberiya kesên rastî tûndiyê hatine, kesên penaber an jî kesên ji ber sedemên cuda di rewşek nazik û bêewleh de ne û çapameniyê nakin. Carna cudahiyên vê hebin jî ev rêzikek gerdûnî ye. Ji bo vê tu dikarî xwe biceribînî, lê heke rêxistinên civaka sivîl ji bo têkildariya kirdeyan bêxwestek bin, hêrs nebe an jî xeterker nebe, çavkaniya nûçeya xwe bi xwe bibîne.

## Baldariya ji bo têkildariyê

Ji pirsên herî zêde yek jî ew e ku ji rêxistinên LGBTI+ tê pirsîn, "Hûn dikarin ji me re du gey û jinek trans bibînin? Em dixwazin anket / hevpeyvîn bi wan re bikin." Pirsa bi vê şêweyê, kesan dike tişt û ji bo kirdeyan gelek nexweş e.

**Di bin her şert û mercan de ji bo mehremiyata kesên hemberî xwe rêz bigire. Dema tu bi kesên rastî binpêkirinên mafan hatine, rastî tûndiyê hatine, jiyana wan xetereyê de ye û hwd. diaxifî pirsên travmaya wan nû dike nepirse, demek travmatîk nû ve nede gotin.**

**Mînak;**

- Ji bo bi kesek rastî tûndiyê an jî binpêkirinek din hatiye re bihevpeyvî, berî têkiliyek germ û ewleh çêbike û bila ew kes bi xwe bi rojnameger re bixwaze bipeyve. Heke red bike, dibe ku ew xwedî sedemek mafdar be. Hetta hinek caran, divê rojnameger gorî etîkê tev bigere, ewlehiya kesa/î rastî binpêkirinan hatiye bigire ber çavan û pêwîst be di nûçeya xwe de cih nede hinek ûnsûran.

- Dema tu bûyerên travmatîk ên wek tûndî û hwd dibêjî, nebe sedema ew kes dîsa dîsa wê bûyerê bijî. Pêwîst be, berîya hevpeyvînê serî li saziyên xizmeta civakî an jî pirsporên ruhî bide.
- Ji bo jiyana taybet û ceribandinên tûndiyê pirsên nazik bipirse. Heke kesê/a hemberî te bixwaze van agahiyên mahrem bi te re parve dike, heterker nebe.
- Ji kesa/ê tu pê re hevpeyviyayî zayendî diyar neke, bipirse ka çawa dixwaze jê re xitap bikî, wisa xitabê wê/î bike, di texta nûçeyê de jî gorî vê tev bigere.

- Dema tu zayendiya kesê/a hemberî nizanibî, jê re bibêje "hûn" an jî bi navê wê/î yê pêşî xitap bike.

- Dema tu çûyî civîna çapameniyê ya rêxistinên LGBTI+yan, ji kesa

daxuyaniyê dixwîne nepirse, “Hûn jî hevezayend in?” Gorî mijara civîna çapameniyê tev bigere. Ji kesa/ê wek berdevka/ê grubek/komeleyek/rêxistinek diaxife derheqê jiyana wê/î ya taybet pirs nepirse, derheqê mijara civînê bipirse.

- Pirsa tu ji heteroseksuelek napirsî ji LGBTI+yan jî nepirse. Çawa tu ji çavkaniya xwe ya heteroseksuel napirsî ku te kengê firq kir tu heteroseksuel î, malbata te çawa nêzik bû an jî tercîha te ji bo seksê çi ye, ji LGBTI+yan jî nepirse.
- Kesê/a pê re dihevpeyvî sûcdar neke, pê henek neke, nedarize û nekişîne jêpirsîne.

## Ji bo civaka sivîl têkildariya çapameniyê

Ji bo çapameniyê têkildariya civaka sivîl çi qasî girîng e, têkildariya civaka sivîl û xebatkarên wê ya bo agahdarkirina bi lez û rast bi çapameniyê re jî ew qasî girîng e.

Agahiyên derheqê xebatên we, hevkariyên we, qadên xebatên we û hwd. çi qasî li ser înternetê cih bigire, ji bo hûn bi axaftinên telefonê dem winda nekin ew qasî baş e.

- Ji xwe re lîsteyek derheqê agahî û qadên xebatên endamên rêxistinên civaka sivîl an jî odeyên pîşeyan amade bikin. Heke hûn dixwazin mijar di nûçeyê de herî baş cih bigire, dema rojnamegerek geriya û xwest bi kîjan pirsporê re biaxife, hûn dikarin vê fersendê baş binirxînin. Her tim bi amadekerî bin.
- Rojevê bişopînin û agahiyên destê we de gorî vê rojane bikin. Dema pêşnûmayek qanûnî ket rojeva Meclîsê, beriya rojnameger bigerin, divê derheqî vê mijarê de helwesta we çibe, kî bi medyayê re biaxife diyar be û bi vê awayê gihiştin û xuyakirina we wê hêsan û pêkan bibe.

• Endam, xebatkar û pirsporên bi rojnamegeran re dikevin nav têkiliyan, bi bawer bin ku hûn xwedî agahiyên ragihanê yên aktîf û rojane yên kesên serî lê dane ne. Agahî û daneyên ji aliyên kesên ser navê saziyê diaxifin ve ji bo medyayê tê dayîn piştrast bikin, vê ji bîr nekin, heke pêwîst be encamên lêkolînên hîn aktûel bidin wan.

• Bi lez bin. Rojeva welat, xwendevan, edîtor heviya dema nivîsandina daxuyaniya çapameniyê, burokrasiya komeleyê, pêvajoya erêkirinê, dawîkirina nîqaşên navxweyî nasekinin. Bigihîjin leza nûçegihan.

• Rojnamegeran wek "yên saziyên mezin ên medyayê" û "yên taxa me" cuda nekin. Ji bo hemû nûçegihanan profesyonel û wekhev tev bigerin. Dibe ku bandora saziyek mezin a medyayê mezin be, lê saziyên piçûk ên medyayê yên serbixwe hîn zêdetir guh didin mafên mirovan. Her wiha ji bîr nekin ku, daxuyanî û çalakiyên ji aliyê saziyên mezin ên medyaya ve nayên şopandin, ji aliyê nûçegihanên van saziyan ve tên şopandin. Ji bo hûn di medyaya gelemperî de "bibin nûçe" agahiyên xwe ji saziyên serbixwe veneşêrin. Heke ambargoyek we heye, bila ji bo herkesî hebe.

• Dema hûn bi endamek çapameniyê re diaxifin, ji bîr nekin ku kesê/a hemberî we rojnamegerek e, ji bo nûçeyê bi we re ketiye têkiliyê. Heke hûn derveyî qeydê (off the record) agahî didin jî, teqez vê bînin ziman. Ji ber ku agahî û nêrînên hûn tînin ziman di çapameniyê de cih digire bi baldarî tev bigerin.

# 14 xalên ji bo di nûçeyan de jêrevîna zayendîtiyê

## Pirsa ewil: Jin û LGBTI+ li kî derê ne?

Hûn dikarin, ji guhertina desteya wezîran heya Merasîma Xelatên Emmy, ji Lîstikên Olîmpiyatê heya guhertinên qanûnan, di her nûçeyê de perspektîfa wekheviya zayendiya civakî bingeh bigirin.

Her carî vê pirsê ji bîr nekîn: Jin û LGBTI+ di ku derê vê bûyerê de cih digirin?

**Di Desteya Wezîran a ji 26 Kesan Pêk Tê de Hêjmara Jinan Ji Yekê bû Dido**
**(Tîrmeh 2017, bianet)**

Serokwezîr Binali Yildirim, piştî hevdîtina bi Serokkomar û Serokê Giştî yê AKPyê Recep Tayyip Erdoğan re, guhertinên Desteya Wezîran eşkere kir. 1

Di Desteya Wezîran a ji 26 Kesan Pêk Tê de peywîra şeş wezîran hate guhertin, pênc kesan jî di desteyê de cih negirtin. 2

Deste ji 24 zilam û 2 jinan pêk hat. Desteya berî de 25 zilam û jinek hebûn. Fatma Betül Sayan Kaya di cihê xwe yê Wezîrtiya Malbat û Politikayên Civakî de ma. Wezîrê Xebat û Ewlehiya Civakî Mehmet Müezzinoğlu derveyî desteyê ma, Jülide Sarıeroğlu hate cihê wî. 3

**Guhertinên di desteyê de**
Wezîrê Dadê Bekir Bozdağ bû Alîkarê Serokwezîr, Abdülhamit Gül bû Wezîrê Dadê yê nû. (… ev hemû guhertin tên rêzkirin.) 4

**(1)** Em di texta nûçeyê de bi bûyera herî rojane destpê dikin.

**(2)** Heya sernava navberê, em ûnsûrên ji bo nûçeyê bi qîmet in rêz dikin.

**(3)** Pişt re em di çarçoveya wekheviya zayindiya civakî li nûçeyê dinêrin û agahiyên pêwîst (heke daneyên wê hebin) lê zêde dikin.

**(4)** Hîn pişt re jî em di bin sernavên navber de cih didin hemû agahî û daneyên bo nûçeyê pêwîst in.

## Vegotina çîrokê ya yekalî

Tu carî çîrokê yekalî neyîne ziman. Ji bîr neke ku agahiyên ji te re hatine pêşkêşkirin gelek caran di pêvajoya avakirina mêr de derbas bûne. Heke agahiyên gihiştine destên te çîrokê yekalî tîne ziman, aliyên din jî hîn bibe. Kemasiya di nûçeyê de bibîne.

Carna çîrokên yekalî, dibe ku bibe sedema pêşdarazî bi sedan salan berdewam bikin û mirov rastî cudatiyan bên.

Wezîrtiya Tenduristiyê ya Tanzanyayê xebatên 40 klînîkên HIV/AIDSê rawestand(iye). Sûcdar kir ku, ev saziyên ne girêdayî dewletê ne Hevzayendîtiyê dihewesîne.

Tê bawerkirin ku HIV bi Hevzayendan re hîn zêdetir e. Li Tanzanyayê HIV ji % 80 bi rêya seksa bê bergirî ya heteroseksuel tê girtin. Li gorî rapora cîhanî ya bi navê “Barcelona Report” ya UNAIDSê, di mezinan de bûyerên HIVê ji % 80 zêdetir bi rêya seksa heteroseksuel tê girtin.
Li Tirkiyeyê jî HIV herî zêde (% 40) bi rêya seksa bê bergirî ya heteroseksuel tê girtin. Pişt re bi rêya seksa bê bergirî ya Hevzayendî (% 15) tê girtin.

Ji bîr neke, di nûçeya ku te nivîsandiye de cih bide van agahiyan. Pêşdaraziyan bi daneyên zanistî bişkîne. Carna jî ji daneyên wek daneyên zanistî tên pêşkêşkirin biguman be.

**Wekî din;**
**Agahiyên nehatine erêkirin, spekulasyonan, “paşgotiniyan” pêşkêşî xwendevanan neke.**
**Bi taybetî di nûçeyên derheqê tûndiyê de, wekî ku dema bûyerê tu li wir bûyî nûçeyê nenivîsîne û bûyerê nebêje. Ji bîr neke ku, ev şêweya nivîsandina nûçeyê, wekî ew ê hêrişkar bi xwe nivîsiye dixuye.**
**Heke hebe, binpêkirinên sîstematîk derbixe pêş.**
**Berpirsiyariya sazî û kesên erkdar nîşan bike.**

## Heke ku dane tune bin, bi xwe kom bike

Ji bo xuyakirina binpêkirinên mafan ên sîstematîk nûçeyên xwe bi daneyan xurt bike.

Heke derheqê mijara te kiriye nûçe de daneyên fermî tune bin, hewl bide ku tu bixwe daneyan kom bikî. Raporên şopandinê tu dikarî ji nûçeyên ku di medyayê de cih girtine amade bikî. Ev her çi qasî rastiya bûyerê weke xwe nîşan nede jî, avakirina mînakekê him ji bo tevahiya bûyereke sîstematîk wê bibe nîşaneyek sembolîk him jî ji bo xebatên komkirina daneyan wê cesaretê bide dewlet û civaka sivîl.

Ji ber ku derheqê mêran de daneyên fermî nayên tomarkirin, Çeteleya Tûndiya Mêran a bianetê ku di 2008an de ji lêkolînkirina nûçeyên rûpelên 3em destpê kiriye, ji vê rojê heya niha bûye arşîvek. Êdî derheqê kujerên jinan, jinên ji ber dixwazin ji mêran cuda bibin ango dev ji wan berdin û tên kuştin û gelek tiştên din de dane hene û ev weke referanst tên qebûlkirin.

KaosGL Rapora di Medyayê de Gotinên Nefretê yên Homofobik û Transfobîk û Rapora Sûcên Nefretê yên Bingeha Xwe ji Transfobiyê Digirin amade dike. Weqfa Hrant Dinkî jî xwedî Rapora Di Medyayê de Gotinên Nefretê ye.

Piştî daxuyaniyekê bi xwe jî bilez tu dikarî li nûçeyan binêrî û çeteleyê amade bikî.

Weke mînak 2017an de dema serokwezîr li bavê jinekê geriya bû û derheqê zewacê de axifî bû, me çeteleya heman daxuyaniyê û hewldanên rayedarên hikûmetê amade kiribû:

**Serokwezîr hîna jî jinan ji mêran "dixwaze"**
**(Adara 2017ê, bianet)**

Di bernameya "Hevdîtina Hemwelitiyan" ya ji aliyê AKPyê ve li Lekoşayê hatibû lidarxistin de, xwendevanekî zaningehê, bi navê Yücel Çakmak (21) ji Serokwezîr Yildirimî xwestibû ku li malbata jina dixwaze pê re bizewice bigere. (…)
Ji hikûmetê xizmetên zewicandinê
* Di 14ê Mijdara 2016an de Serokkomar Erdogan, li ser FaceTime li bavê dergistiya lîstikvan Murat Yildirimî geriya û destûra zewaca wan xwest.
* Di 25ê Çileya 2016an de Serokwezîr Davûtoglû, tevlî merasîma beriya zewaca karsazek navbera malbatan de hatibû lidarxistin bibû, li cem Davutoğlu medya jî hebû.
* Di 12ê Tîrmeha 2016an de Serokwezîr Binali Yıldırım, li jina polêsek dixwest pê re bizewice geriya, berî bi jinê re, pişt re jî bi bavê wê re axifî. (…)

## Wekheviyê neke vîtrîna nûçeyê, bike navendê

Jin û LGBTI+, ji rûpelên "rindî û xweytî", "malbat", "zarok", "moda û makyaj", "tûndiya mêr" zêdetir in. Ji derveyî van kategoriyan li nûçeyan binêre ku gelo "bandoreke çawa" li ser "jin û LGBTI+yan" dike.

**"Heke ku Jin Bixwaze Neviyên Xwe Xwedî Dike, Lê Divê Dewlet Xizmeta Xwedîtiyê Bike"** **(Çileya 2017ê, bianet)**

Jinên neviyên xwe xwedî bikin pere digirin. Ünlütürk Ulutaş, derheqê vê daxuyaniyê de ji bianetê re axifî û got, "Helbet dapîrek dixwaze neviyê xwe xwedî bike, lê peywîra (dewletê) divê pêşxistina derfetên xwedîtiya sazîbûyînî be."

**Mehaneya Ji Bo Jinên Neviyên Xwe Xwedî Dikin: 425 Lîre**
**(Sibata 2017ê, bianet)**

Protokola bi navê "Projeya Dapîrê" îro hate îmzekirin û li gorî vê protokolê dapîrên ku wê neviyên xwe xwedî bikin dê meaş bistînin. Wezîrê Malbatê, got ku armanc, "xurtkirina têkiliyên kevneşopiya malbatê û piştgiriya îstîhdama jinan e" .

---

*Ji bo xizmetên xwedîkirinê û karên malê wek "kevneşopiyek" jin tên wezîfedarkirin. Ji ber ku ev ked nehatiye mizekirin wek "keda nexuyayî" tê binavkirin.

Wezîrê Xebat û Ewlehiya Civakî Mehmet Muezzînoglû gotibû ku em ê pereyên xwedîtiyê bidin jinên ku li malê neviyên xwe xwedî dikin. Piştî vê daxuyaniyê proje bi navê “Projeya Dapîran” ji raya giştî re hate ragihandin. Proje wek “Dapîra Super meaşê xwe ji bo neviyê xwe xerc dike”, “Ji bo dapîran promosyon”, “Meaş heye ji bo dapîrên neviyên xwe xwedî bikin!” bû nûçe. Feraseta xwedîtiya zarokan tenê kar û peywîra jinan dibîne, bê lêpirsîn wisa hate rewakirin. Xwedîtiya zarokan ji dayîkan girtin dan dapîran.

Ji klîşeyên weke dayîk pîroz in dûr bisekine, keda ku nayê dîtin* ji bîr neke. Tu dikarî di vê nûçeyê de peywîra bavitiyê ya bavan bi bîr xînî, keda jinan ya nayê dîtin dikari bidî xuyakirin, dikarî pirsgirêka tûnebûna kreşên bêpere û yên gihîştina wan hêsan bînî rojevê.

Mafê axaftinê bide pirsporan, aktîvîstan û dayîkan, ramanên wan bipirse. Her tim bi guman û bi pirsiyar nêzikî helwestên wek “jest” tên nişandan bibe. Rewşên ku wekheviyê şên dikin bide xuyakirin. Ev xuyakirin, wê piştgirî bide zêdebûna mînakên erênî.

## Destkeftiyên Mafan Weke “Jest” Nîşan Nede

Destkeftiyên jin û LGBTI+yan weke ku jest in tên nîşankirin:

25ê Mijdarê Roja Têkoşîna Navnetewî ya li Hemberî Tûndiyê ya li ser Jinan, Tirkiye bû alîgirê Peymana Konseya Ewrûpayê ya Derheqê Astengkirina Tûndiya li ser Jinan û Tûndiya Nav Malê û Têkoşîna li Hemberî Wan, ango wek tê zanîn Peymana Stenbolê. Alîgiriya Tirkiyeyê bi van sernavan bûne nûçe: “Ji bo Jinan Jesta 25ê Mijdarê”, “Îmzeyeke Mêran ji bo li Hemberî Tûndiya li Ser Jinan”, “Tirkiye ‘bi Jinan re’ Peyman Çêkir”.

Qanûna bi nimroya 6284 û bi navê Qanûna Derheqê Parastina Malbatê û Astengkirina Tûndiya li ser Jinan jî weke bi sernavên “Ji Meclisê bo Jinan Dîyarî”, “Yên li Jina Xwe Bide Malik lê Wêran Bû” ji xwendevan re hate pêşkêşkirin.

Nûçeyên derheqê wekheviya zewacê de bi sernavê “Li Wî Welatî Tiştê Yekemîn! Kesên Hevzayend Dikarin Bizewicin” hate pêşkêşkirin.

Di nûçeyên xwe de ji bîr neke ku qanûn û biryarname çi dihewînin, ew têne çi wateyê, ew çawa bandor li ser mirovan dikin, ji bo çareseriya pirsgirêkên civakî çi pêşkêş dikin, pêvajoya guhertinê çi bû, têkoşîna sivîl a vê guhertinê pêkan kir çi bû. Nûçeyên wek “Xanimno mizgînî bo we, em êdî xwedî qanûneke gelek xweşik in” bes nebîne.

## Klîşeyên zayendî bi kar neyîne

Çîroka jina ku dixwest bibe hostayê motorê di gelek weşanan de wiha cih girt: “Di destê wê de li şûna ojeyê rûnê motorê heye.” Jin û LGBTI+ dema di nav karên desthilatdariya mêran de ji xwe re cih çêdikin dibe ku her tim bibin nûçe, lê “ojekirin an nekirin” ne yek ji hîmên vê nûçeyê ne.

Di trafîkê de qeza, ji ber xetayên şofêr û rêwiyan, ji ber rewşa rê çêdibe. Di nûçeyê de wiha hatiye gotin: “Şofêrê dema kilam digot qeza kiriye!” Dibe şofêr zilam an jî jin be, bandora vê vê li ser sedem û encama qezayê nîne.

Lê li aliyê din, têkoşîna wan jinan her tim mijara nûçeyê ne ku tenê ji ber jin in şofêrtî ji bo wan qedexe ye.

**Doza Derheqê Qedexekirina Ehliyetê ya ji bo Jinan**
**(Mijdara 2012ê, bianet)**

Li Erebîstana Siûdiyê Nassima el-Sadah, ji ber qedexekirina ehliyetê ya ji bo jinan derheqê Wezareta Navxweyî de doz vekiriye. Sadah got ku beriya dozê veke, weke çalakiyekê, bi dehan caran ji bo ehliyetê serî lê daye.

**Li Erebîstana Siûdiyê Wê Jin Karibin Bibin Ajokar**
**(Îlona 2017ê, bianet)**

Mîrê Erebîstana Siûdiyê, biryarnameyek weşandiye ku li gorî vê biryarnameyê jin wê karibin erebeyan bajon. Li Erebîstanê jinan bi salan e wêneyên xwe yên li ber dîreksiyonê parve dikirin û qedexe protesto dikirin. Gelek jin hatibûn girtin.

Nûçeya ewil, derheqê doza dijî qedexekirina şofêrtiya jinan bû, ya duyem jî derheqê li hemberî vê qedexikirinê destkeftiya jinan de bû.

Di nûçeya ewil de, me berê pêşketina herî nû nivîsî û pişt re jî paşeroja binpêkirin û newekheviya vî mafî anî ziman. Nûçeya duyem jî derheqî heman bûyerê û destkeftiya mafan de bû. Dema vê destkeftiyê dinivîsînin em him têkoşîna ku tê birêvebirin him jî wek ku di vê mînakê de tê dîtin cudatî û binpêkirinên li hemberî jin û LGBTI+yan ên li welat bi bîr tînin.

**Li têkoşîna mafan a jin û LGBTI+yan binêre, bal bikişîne ser newekheviyan, jin û LGBTI+yan neke vîtrîna nûçeyê, bike navenda wê û dev ji şopandina mijarê bernede.**

## Jin û LGBTI+yan tenê di “rojên taybet” de bi bîr neyîne

Rojên weke Hefteya Rûmetê, 8ê Adarê Roja Jinan a Cîhanê, 25ê Mijdarê Roja Têkoşîna Navnetewî ya li Hemberî Tûndiyê ya li ser Jinan di encama têkoşînên mafan de hatine bidestxistin. Di van rojan de medyaya gelemperî jî berfireh cih dide jin û LGBTI+yan. Lê jin û LGBTI+ li derveyî van rojan jî hene.

**Budçe jî Mêr e** **(Mijdara 2011ê, bianet)**
Civîna Komîsyona Budçe û Planê ya Meclîsa Netewî ya Mezin a Tirkiyeyê li ser budçeya 2012an berdevam dike. Wekîla Partiya Demokrasî û Aştiyê ya Amedê Nûrsel Aydogan, derheqê di civînê de gelo Budçekirina ji bo Zayendiya Civakî Baldar e hatiye rojevê an na ji bianetê re axifî.

Di her demsaliya qanûnî de li Meclîsê hevdîtinên budçeyê hene. Ev hevdîtin bi gelemperî di çarçoveya mijarên budçeya çek û şer, budçeya Serokatiya Diyanetê, budçeya perwerdehê

û tenduristiyê de dibe nûçe. Lê budçeya ji bo van hemû kategoriyan tê amadekirin wê bandoreke çawa li ser pêkhateyên cuda yên civakî bihêle nayê nîqaşkirin. Heke bi nêrîna zayenda civakî li van nûçeyan binêrin dibe ku destkeftiyên mafan derbikeve holê.

## Li ser navê kirdeyê hincetan çêneke

Rolên zayenda civakî, bi hinceta nirxên ehleqî (ku ji bo herkesî tê guhertin) bi kar neyîne. Kesê/a mexdûr, weke kesek sûcdar û bûye sedema bûyerê, loma jî her tişt bo wî/ê rewa ye nîşan nede. Sedema tûndiyê di mexdûr de nebîne.
Tiştên weke lixwekirina kurtedamen, di nîvê şevê de gera kolanan, bêyî bizewice têkiliya bi kesekî re, karkeriya seksê nabe hinceta tûndiyê. Ji bîr neke ku sedema rewa ya tûndiyê û binpêkirinên mafan tune ye. Tûndî, tûndî ye.
Di nûçeya derheqê êrîşkirina bi armanca nefretê de sernava “Gotibû ez jin im, lê mêr derket”, di nûçeya derheqê kuştinê de sernava “Mêrê bi hêrs her tişt serûbin kir”, di nûçeya derheqê tacîzê de sernava “Carekê dest biavêje, du salan di zindanê de bimîne”, nûçeya derheqê çêkirina qanûna cezayê de sernava “Kesê ku tecawizê bike malik lê wêran bû” bi gelemperî tê bikaranîn. Sernavên wiha, derheqê jiyana taybet a mexdûrê de hinek tiştan ji ber re diavêje û bi vê awayê jî xizmeta rewakirina kesê êrîşkar û krîmînalîzekirina mexdûrê dike.

**Rastiyên Asumanê** **(Pûşpera 2014ê)**

Asuman S. ya di navenda eşqa segoşeyî de cih digirt, di îfadeya xwe de gotiye ku têkiliya wê bi doçent re hebûye. Sekretera zewicî îddîa kiriye ku ji ber bi gumanbar re nebûye, di telefonê de rastî tacîzê hatiye.

**Zilamekî Zilamek Kuştiye, Du Jin Bê Kar Mane**
**(Pûşpera 2014ê, bianet)**

Piştî di zaningehekê de Prof. Dr. X. Y., Doç. Dr. Y. Z.yê kuşt, hevsera kujerê gumanbar dekan Prof. Dr. V. Y. û sekreter A. S. ya tê îdiakirin ku bi kujerê gumanbar re têkiliya wê hebûye ji kar hatin avêtin.

Di nûçeya bianetê de jî, normên zayenda civakî ji holê hatiye rakirin, heta ev norm carna hatine çepûrastkirin û tenê daneyên berbiçav bûne nûçe. Ango li ser gelo di bûyerê de sansasyon çêdibe an na nerawestiyaye, bal hatiye kişandin ku rastî çi bûye.

Şûna xwendina nîyetê an jî texmînkirinê, nûçeya xwe bi daneyên berbiçav çêbike.

## Manşetên wek "cînnet" diyar neke, êrîşkar wek "nexweş" nîşan nede

"Cînnet" di nûçeyên tûndî-kuştinê de wek klîşeyeke gelen caran tê bikaranîn. Ji bîr neke ku "cînnet", ji aliyê kesên jin an jî di heman demê de gelek kes dikujin ve bi awayekî dilxweşî wek hincetekê tê bikaranîn.

Em dibînin ku di nûçeyan de kirde, gelek caran bi navên "canî", "cinawir" cih digirin. Ev feraset, wê bûyera tûndiyê wek "ji aliyê caniyekî ve hatiye kirin û bûyerek tekane ye" nîşan dide.

**Kuştin/tûndî ya piştî tûndiya mêr a sîstematîk pêk tê, bûyerek ne tekane ye û ne tenê di wê demê de qewimiye. Nebêje "cînnet" û ser re derbas nebe, bipirse ka nimûneyên kuştinê berî de hene an na.**

Komîsyona Jin û LGBTIyan a Sendîkaya Rojnamegeran a Tirkiyeyê bi daxuyaniya bi sernavê "Ne Cînnet, Kuştin" wiha bang li rojnamegeran kiriye: "Dev ji rewakirina tûndiya mêran, kuştina jinan berdin."

**JI HEMKARÊN ME RE NAMEYA ME YA VEKIRÎ:**
**Dev ji rewakirina tûndiya mêran, kuştina jinan berbidin,**
**Ne "cînnet", kuştin!**

**Li gorî ferhanga Saziya Zimanê Tirkî, wateya "cînnet"ê ku peyvek Erebî ye, di Tirkî de dînbûn e. Wateya "anîna cînnetê" di Tirkî de jî "Di cih de nîşandina nimûneyên dînbûyînê" ye.**
**"Dînbûyîn", tê wateya rewşa dînbûnê. Nûçika "dîn" jî ji bo kesên eqlê xwe çûye an jî rewşa eqilbûna xwe xirab bûye tê bikaranîn. (…)**
**Eşkere ye ku ji bo cudatiyên li hemberî jinan, tûndiya mêran û kuştin bi dawî bibin berpirsiyariyek mezin dikeve ser milê kedkarên çapameniyê. Êdî divê em dev ji gotinên cudatiyê, tûndiyê, kuştinê ku rewa û rûtîn dike berdin. "Cînnet" jî yek ji wan peyvan e.**

**Kanûna 2013ê**

Pêkhatina tûndiya fîzîkî an jî zayendî ne nexweşî ye, zilamên tûndî pêk tînin jî kesên di rewşa patalojîk de nîn in, kesên di nav me de ne.

Kirdeyên tûndiyê wek kesên di aliyê ruhî de xwedî nexweşiyê ne nîşan nede. Nexweşiyên wek depresyon, şîzofrenî di nûçeyên xwe de bê wate bi kar neyîne û bi vî awayê tûndiyê re hincet nîşan nede, her wiha kesên xwedî van nexweşiyan in gumanbar neke.

Lewre pispor her tim radigihînin ku, zilamên tûndiyê pêk tînin ne xwedî nexweşiyeke tedawî bibe ne, sedemên tûndiyê bi gelemperî patolojîk nîn in, civakî ne.

**Komîsyona Jinan a Komeleya Psîkologan a ji bo Piştgiriya Civakî**
**"Kuştinên jinan, ji tacîzên di jiyana rojane de pir caran pêk tên, ji tûndiyên din ên fîzîkî, zayendî, aborî û psîkolojîk ku jin dijîn, ji pratîkên cudatiyê dûr û azade nîn e. Ji ber vê, heke zilamên tûndiyê pêk tînin wek kesên caniyên çavsor, nexweş û rêşaş, cînnet anîne, ango wek zilamên "din" bên nişandan, ev tenê xizmeta kêmdiyarkirina kuştinên jinan û tûndiya ser jinan a li welatê me û piçûkdîtin û tekanekirina van bûyeran dike. Her wiha ev, tûndiyên bi şêweyên din ên kirdeyên wan jî zilam in reş û asayî dike."**

**Sibata 2015ê**

## Agahiyên nasnameya kesan na, gotinên wan ber bi çav bigire

Binpêkirineke sereke ya ku derheqê kesên trans de her zêde tê dîtin, navên ew di nûçeyan de bi kar tînin wek "bernavk" cih digire, lê ji bo wê kesê bi navê dema jidayîkbûnê de lê kirine tê behskirin. wek vê, curbicuriya nasnameyên zayendî nayên dîtin û kesên me behsa wan kiriye, di nûçeyan de di çarçoveya heteroseksueliyê de cih digirin.

Li şûna gotinên wek "Travestî Abdullah C. a bernavka Ayşe bi kar tîne", ew ji bo xwe çi nav û nasnameyê qebûl dikin tu jî wê bi kar bîne (wek "Transa bi navê Ayşe")

Heke tişta di qeyda rêveberiya nifûsê de hatiye nivîsandin ûnsûrek nûçeyê nebe, divê em jî ji kesa xwe bi navê "Ayşe" dide nasîn û herkes jî wisa wê nasdike wek "Ayşe" behs bikin, ji ber di nasnameya wê de "Abdullah" hatiye nivîsandin nebêje "Abdullah". Dema tu di nûçeya xwe de behsa Cüneyt Arkın dikî navê wî wek "Fahrettin Cüreklibatır" nanivîsî, ne wisa?

## Tûndiyê romantîk nîşan nede

Hesûdîtî, nîşaneyek hezkirinê nîn e, mudaxeleyek bo astengiya jiyanê ye. “Namûs”, rûmeta zilaman nîn e, hinceta kuştina jinan e. Kuştina eşqê tune ye, binpêkirina mafê jiyanê heye. Tûndiya romantik tê nişandan, kuştinê rewa dike.

Gotinên wek “Kuştina hesûdîtiyê”, “Got gelek jê hez dikim”, “Dema teklîfa wî ya lihevhatinê nehatiye qebûlkirin cinûnî bûye”, “Lêborîna xwe xwest, dema nehat qebûlkirin, pêşiyê hezkiriya xwe şûn de jî xwe kuşt” bi kar neyîne.

**Bi baldar be ku bi gotinên wek “Xwe kuşt” û hwd. xwekuştinê romantîze neke.**
**Tu dizanî ku ji kujerên jinan % 16, piştî kuştinê xwe dikujin? Ji % 11 jî teslîm dibin.**

## Xwe nexe li şûna êrîşkarî

Xwe nexe li şûna kujeran, ji bo bûyerên tûndiyê hincetan nîşan nede, ji bo “femkirinê” hewl nede. Mirov in ên ku nûçeyan çêdikin û carna bûyerên di nûçeyan de derbas dibin, serpêhatî û travmayên nûçegîhan an jî edîtoran tîne bîra wan. Lê çi dibe bila bibe bi rengekî şexsî nêzî nûçeyê nebe, ji bo binpêkirinê hincetan çêneke, tûndiyê rewa neke.

Dema tu vê dikî, destûr nede binpêkirinên mafan ên bo kirdeyê jî. Ev nêzikatî xizmeta çareseriya civakî û siyasî ya pirsgirêkê nake, xizmeta çanda lîncê dike. Nebe sedema pirsgirêkeki sîstematîk bibe hêrsek tenê bo yek kirdeyek.

## Di nûçeyê de nehêle tundî ji nû ve were avakirin

Destûr nede ku nûçe bibe tûndiya hemberî kesên navê wan di nûçeyê de derbas dibe.

Nûçeyên wek magazîn û sporê jî ku gelek caran tê gotin “çi têkiliya xwe bi tûndiyê re hene”, dem bi dem bi xwe dibin tûndî.

wek mînak, di Avrêla 2017an de, nûçeyek li ser hesabê medyaya civakî ya rûpelên sporê ya saziyek mezin a medyayê de hatibû belavkirin û di wir de hatibû gotin ku “Wêneyên hevsera futbolvanê nasîn ên tazî li ser înternetê hatine belavkirin”. Ev wêne jî wek şilû hatibûn parvekirin.

Gelek caran wêneyên kesên ji aliyê raya giştî ve tên nasîn bê destûra wan an jî wek ji telefonên wan tên dizîn di medyayê tên belavkirin.

Nûçeya derheqê binpêkirina daneyên keseyatî, wan daneyên hatine dizîn parve dike û bi vî awayî binpêkirinê ji nû ve avadike. An jî navnîşana stargeheke ku ji aliyê şarederiyek ve hatiye vekirin di rojnameyek herêmî de bi zelalî tê nivîsandin. Lê divê navnîşana van stargehên kesên rastî tûndiyê hatine tê de dijîn ji bo ewlehiya wan veşartî bimîne.

## Daneyên di dokumanên fermî de cih digirin bi baldarî bi kar bîne

Rojnameger, bi hêsanî digihijin raporên saziya tipa edlî û zabitnameyên polisan, bi taybetî jî yên derheqê bûyerên tûndiyê de. Dema doz tê vekirin di îdianameyê de û zabitên rûniştinên dozê de ji nimroya nasnameya T.C.yê heya navnîşan û nimroya telefonê gelek agahiyên derheqê kesan de cih digirin.

Her çi qasî ev dokuman derheqê darazê de bin û loma eşkere bin jî, dema bi temamî di nûçeyan de cih bigirin dibe ku jiyan û qada taybet a kesan eşkere bibe.

Di nûçeyê de heya pêkan be teswîrkirinên di zabitnameyên cihê bûyerê û raporên tipa edlî de cih digirin bi kar neyîne. Agahiyên derheqê bûyera tûndiyê de ji ber sedemên hiqûqî di van zabitname û raporan de gelek berfireh cih digirin.

Lê heke ev agahiyên berfireh bi temamî di nûçeyê de cih bigirin, tiştên kesê/a rastî tûndiyê hayite jiyaye bê razibûna wê/î eşkere dike. Her wiha ev agahiyên berfireh, dibe ku him ji bo kirdeya nûçeyê him jî ji bo kesên heman bûyerên tûndiyê jiyane bibe sedema nûkirina travmayan. Ji vê dûr bikeve. Ji pêwîstiyan zêdetir nenivîsîne.

# Zimanê Nûçeyan

## Hevokên tebatî na, yên lebatî bi kar bîne

Ji hevokên kirdeyên wan ne diyar û tebatî dûr bisekine. Wek mînak, li şûna "Ji bo jinan mafên hilbijartin û hilbijirînê hat nasîn", bibêje ku "Jinan mafên hilbijartin û hilbijirînê bi dest xist" an jî "Parlamentoyê qanûna ji bo jinan mafên hilbijartin û hilbijirînê dihewîne erê kir"

Dema tu nûçeyekê çêdikî, ewil kirdeyê diyar bike. Li gorî te jî di hevoka "Jinek hate kuştin" de pirsgirêkek tune ye? Kujer kî ye? Li şûna vê hevokê, hevoka lebatî bi kar bîne: "A.B., hevsera xwe C.B. kuşt."

Ne mexdûran lê kirde û binpêkirinan eşkere bike.

## Di teksta nûçeyên de bi peyvan nelîse

Ji bo balkişandina li ser nûçeyê di sernavan de gelek caran bi peyvan tê lîstin.

Pirsgirêk nîne ku ji bo nûçe bigihîje gelek kesan hewl bide. Lê dema tu vê dikî, nebe sedema binpêkirinan, kirdeyên nûçeyê neêşîne, pêşdaraziyên civakî nû neke, trajediyan wek komedî nîşan nede, tûndiyê neke pornografîk. Daxwaza te ya ji bo nûçeyê hîn zêdetir bê xwendin, bila pêşî li etîka nûçegîhaniyê negire.

## Pornografîkkirina nûçeyê

Ji nêzikatiya nûçeyê pornografîk dike ku wek teswîrkirina tûndiyê, agahdarkirina berfirehiyên agahiyan, teswîrkirina tûndiya zayendî dûr bisekine. Dema te nûçeyek tacîzê ya wek bi ser-

nava "Çiçikên wê mizda" an jî nûçeyek tecawizê ya wek sernava "fanteziya bi kelepçeye", "şev di nav nivînan de qediya" çêbikî, tacîz, tecawiz, tûndiya bingeha xwe ji zayenda civakî digire tê reşkirin, nayê xuyakirin. Tacîz û tecawiz tiştekî erotîk nîn e; dijî giştî û destnedayîniya bedenê sûcek gelek ciddî ye.

Divê teksta te ya nûçeyê cih nede gotinên kesên rastî tûndiyê hatine wek objeyên zayendî nîşan dide, wan kesan dîsa mexdûr dike û diêşîne.

Hêjmara agahdarkirina tacîz û tecawizê ji bo meqamên fermî gelek kêm e. Piraniya bûyeran veşartî dimînin. Li gorî lêkolînan*, li Tirkiyeyê ji jinan % 38 di jiyana xwe de herî kêm carekê rastî tûndiya fîzîkî yan jî zayendî hatine. Hêjmara yên ku ji ber rastî tûndiyê hatine serî li saziyeke dane jî tenê % 11. Derheqê zilamên rastî tecawizê hatine de jî tu agahiyên rast tune.

Bifikire ku gelek kesên nûçeya te dixwînin di heman rewşê de ne û ev nûçe li ser wan çawa bandor dike. Bi baldar be ku bila nûçeya te derheqê mafan agahî bide û li dijî binpêkirinên mafan jî rê nîşan bide.

## Gotinên zayendperest ji nav ziman derxe

Her tim li ser peyvên tu bi kar tînî bifikire, biçe bingeha wan. Dibe ku bingeha gotinên tu bi salan e bi kar tînî û dibihîzî mêr, heteronormatîf û zayendperest be.

**Heke bûyerek bi gotinek zayendperest tê gotin, tu ne mecbûr î wê bi kar bînî. Derheqê zimanê hûn bi kar tînin di lijneya karê nivîsê de nîqaş bikin. Gotinên hûn qet li ser nasekinin û bi gelemperî bi kar tînin, di rastiyê de dibe rê li ber cudaxwaziyê veke.**

* "Lêkolîna Di Tirkiyeyê de Tundiya Nav Malê ya Ser Jinan 2014" a Wezîrtiya Malbatê û Polîtîkayên Civakî piştgirî daye û ji aliyê Enstîtuya Etûtên Nifûsê ya Zaningeha Hacettepeyê ve hatiye çêkirin.

Komîsyonek ji 63 kesan pêk dihat hatibû avakirin. Ev komisyona wek “Desteya Mirovên Eqilmend” dihat binavkirin, di medyaya gelemperî de wek bi gotina “Zilamên Eqilmend” bibû nûçe.

Dema Avrêla 2013an de deste ji kîjan navan pêk hatiye hatibû ragihandin, bianetê bi vê sernavê nûçeya xwe çêkiribû: “Gotibûn zilamên eqilmend û bû: 12 jin, 51 zilam” Bi vê awayê him gotina medyayê rexne kiribû him jî daneyên berbiçav ên derheqê vê komîsyona tenê ji “zilaman” pêk nehatibû kiribû nûçe.

Li bingeha peyvan, gotinan, qaliban û biwêjan binêre, gotinên zayendperestî sererast bike. Bi baldar bibe ku gotinên tu bi kar tînî bila hemû cure û pêkhateyan bihewîne.

Ji bo di zimanê ku tê bikaranîn de gotinên zayendperest neyên pêkanîn hin pêşniyarên me wiha ne:

| | | |
|---|---|---|
| Bayan* | NA | Jin |
| Erkek çocuğu - Kız çocuğu* | | Zarokê kur – Zaroka Keç |
| LGBTyî | | LGBTI / LGBTI+ |
| Gay | | Gey |
| Travestî | | Trans |
| Zilam | | Mirov |
| Benî Adem* | | Mirovahî |
| Bilim adamı* | | Bilim insanı |
| İşadamı* | | Karmend |
| Paşnavê keçiktiyê | | Paşnavê berî zewacê |
| Meylên zayendî yên cuda | | Meylên zayendî yên curbecur |
| Zewaca hevzayendî | | Wekheviya zewacê / zewaca wekhevî |
| Zayenda / cinsiyeta xwe guherand, jin bû xwe kir zilam | | Derbasbûyîna xwe ya zayendî / cinsiyetê temam kir |
| Keçanî / qîzanî | | Hymen / hîmen |
| Jinên Lazan / Ermeniyan / Kurdan | | Jinên Laz / Ermenî / Kurd |

* Di zimanê tirkî de “bay” mêr e û “bayan” jî “ew kesên ne mêr” in. Jin bi zimanê tirkî “kadın” e. Ji ber wê li şûna gotina “yên ne mêr(bayan)” divê gotina “kadın” bê gotin.
* Di nûçeyên zarokparêz an jî nûçeyên li ser zayenda civakî de “zarokbûna” keç û kuran gelek giring e. Ji ber wê divê gotina zarok bê nivîsîn û paşê zayend lê bê zêdekirin: Zaroka keç, zarokê kur.
* Adam bi zimanê tirkî “mêr” e lê carinan ji bo “mêrxwas” jî tê gotin.
* Her weha ji bo “İnsanoğlu”ya tirkî jî bi kar anîna gotina mirov baştir e.
* Di zimanê tirkî de ji bo karsazan “iş adamı(mêrê karsaz) ji bo zanistan “bilim adamı(mêrê zanist)” tê gotin lê di nûçeyan de divê “iş insanı(mirovên karsaz)” an jî “bilim insanı(mirovên zanist)” bê nivîsîn.
*Di zimanê tirkî de ji bo karsazan “iş adamı(mêrê karsaz) ji bo zanistan “bilim adamı(mêrê zanist)” tê gotin lê di nûçeyan de divê “iş insanı(mirovên karsaz)” an jî “bilim insanı(mirovên zanist)” bê nivîsîn.

“Derket pêşberî xwezgîniyan”, “wek qîzan / keçan / jinan”, “şerê qîzan / keçan / jinan” “êrîşa nemerdî”. Em vana nanivîsînin.

## Li ser zimanê heteronormatîf bifikire

Her çi qasî di hemû cîhanê de pergala dualî (heteronormatîf) ya zayendî bê qebûlkirin jî rastî ne ev e. Di civakê de tenê jin û mêr, zarokên keç û kur tune ne. Dema tu nûçeya xwe amade dikî zimanê xwe li ser dualiya zayendî ava neke. Curbecuriya zayendî û herkoyîbûna / danûstendina zayendî heseb bike.

Facebook jî 54 nasnameyên zayendî nas dike. Dibe ku tu di nûçeya xwe de cih nedî ew qasî nasnameyên zayendî, lê ya girîng ew e ku van tune nehisibîne

## Zimanê mîlîtarîst bi kar nîne

Di demên şer de nûçe jî dîmen jî ji mîlîtarîzmê para xwe digirin. Di bûyerek sivik / besît de jî alîgirî, bi awayekî zayendîtîkirina alîgiran tê diyarkirin.

Manşetên rojnameyan piranî ji gotinên wek “Êrîşa qehpe”, “Em ketin gûva wan”, “Bênamûs”, “Axa welat namûs e”, “Dayîkên leşkeran” pêk tên.

Mîlîtarîzm “welat” wek jin, “parastvanên welat” jî wek mêr/

zilam nîşan dike. Şer, alîgirê kijan aliyî be wî dike "zilam/mêr", yên din jî dike "jin". "Dikevin" ew "axa ku hatiye fethkirin", heke axa wan bi xwe bibe mijar, gotin jî dibe "dagirkirin"*.

Nûçeyê wek "em/me" ranegihîne. Di medyaya berbelavbûyî de piranî tê dîtin ku dibêjin "Em ji sînor derbas bûn / Me sînor derbas kir", "Me maç qezenç kir / Em di maçê de serkeftî bûn". Di qadên şer de hinek rojnameger xwe wek endamê arteşê dihesibînin û wiha nûçeyê dinivîsînin. Ji bîr neke, rojnameger alîgirek an jî parastvanekî/e şer nîn e.

Pêwîst nîne ku tu bi gotinên leşkerî / mîlîtarîst nûçeyê binivîsînî. Dibe ku herkes van peyvan nizanibe an jî tu kes mecbûr nîne van peyvan bizanibe.

Ji bîr neke gotina "jin"ê ne gotineke heqaretê ye. Dema kes û sazî wek jin tên hesibandin, tê xwestin ku bi vî awayî ew bêrûmet bibin. Bi rastî ev tişt, tûndiyek li dijî jinan e.

Heke tu ji van tiştan dûr bisekinî, bi vî awayî tu him li gorî nêrîna zayenda civakî tev digerî him jî tu navtêdana şerî nakî.

## Lêbikole û zêdetir hîn bibe

Nefret ji nezaniyê çêdibe. Tirs ji tiştê nayê zanîn çêdibe. Gelek xeletiyên di nûçeyan de jî ji nezaniyê pêş tê. Ji bo ev nezanî ji holê rabe û pirsên di serên mirovan de cih digirin bên bersivandin û kesên nikarin bigihijin agahî û zanistê rê bê nişandin, nûçeyan çêbike.

Derheqê gotin û mafan de bixwîne, lêbikole û hîn bibe. Gotinên bi şaş tên bikaranîn û zayendperestî, heteronormatîf yên wek "Tercîha zayendî", "paşnava qîzaniyê" sererast bike. Heke tu di nûçeya xwe de rast bi kar bînî, xwendevan / temaşevan jî ya rast hîn dibin.

* Sevda Alankuş, Pirtûka Destan a Rojnamegeriya Aştîxwaz, Stenbol: Weşanên Weqfa Ragihandinê ya IPSyê, 2016.

## Di hilbijartina dîmenên nûçeyan de tiştên girîng

Dema te dîmenê nûçeyê hilbijart, baş bizanibe ku ew wêne klîşeyan nû ve ava dike yan na. Bi taybetî jî di nûçeyên tûndiyê de wêneyên bi hêz dikin, sûc beralî dikin, yên gilîkirina sûcî teşwîk dikin bi kar bîne.

Çend wêne hene ku dema “nûçeya tûndiya li ser jinan” dibe mijar tên hişê mirovan: Jinên çavên wan reş bûne, jinên têne hincirandin û jina ji ber kulma zilam a di kadrajê de li pêş e çilmisiye û xwe daye ber dîwarekî.

Em rastiya van wêneyên wek mizansen her roj dibihîzin, dibînin û dijîn. Ji bo ragihandina tûndiyê, alternatîfek, bikaranîna dîtbariyên ji nû ve tûndiyê ava dikin nîn e.

Wêneyên jinan bêhêz nîşan didin û travmayên nû yên gelek kesên wek xwendevan in û rastî tûndiyê hatine ava dikin, bi kar neyîne.

Wêneyên li ser medyaya civakî yên kesên di nûçeyan de behsa wan tê kirin an jî wek pispor / şahid cih digirin, bê destûr wek dîmenê nûçeyê bi kar neyîne.

Di nûçeya tûndiyê de wêneyên kirde û mexdûran ên wek “di rojên kêfxweş de bi hev re ne”, wêneyên zewacê û mehrê bi kar neyîne. Ev têkildarê nûçeyan nîn in û her wiha dîmenên romantîk in.

Bi baldar be ku wêne bêalî be, her çi qasî pozên seksî an jî pevxistî bêhtir balê bikişînin jî bi kar neyîne.

Di dîmenên xwe de rêzê li curbecuriya zayendî bigire. Dema nûçeyên derheqê zewac û berdanê de an jî nûçeyên din de, heke pêwîst be tu wêneyên hezkiriyan bi kar bînî, wê demê wêneyên hezkiriyên hevzayend jî bi kar bîne.

Dîmenên ku curbecuriya zayendî naxwaze bibîne û sivik yên wek wêneyên F16an yên pozên wan ber bi hewayê ve, zilamên eniya jinan maç dikin û tenê cotên heteroseksuel dide xuyakirin an jî grafîkên tenê cih didin fîgurên zilaman, bi kar neyîne.

Dema te ji bo nûçeyê grafîk amade kir jî, ji bo curbecuriya zayendî bi baldar be. Heke di grafîkên te de bi vektorên mirovan amade kiriye û mijarê li gorî zayendiyê vedikole de tu tenê vektora mirovên yek tîp bir kar bînî, ev zilam nîşan dide. Heke naveroka daneyan, wek mînak, derheqê nasnameya zayendiya zilam de be, tu dikarî vektora mirovên yek tîp bi kar bînî û vê rengînî bikî. Lê dema tu bi xwazî dîmenên daneyên nasnameyên zayendiya jin û transan çêbikî, wê demê vektorên xwe curbecur bike. Jinan bi wektorên por û etek lê hatine zêdekirin dikarî nîşan bidî. Lê dibe ku ji bo diyarkirina jinan bikaranîna por û etekan tu wek rêbazek klîşe û zayendî jî binirxînî. Wê demê divê tu hîn avaker bî û tu dikarî rêyên cuda ji bo ûnsûrên li vektorê zêde bikî bibînî.

## Sernava xwe rast hilbijêre, nêçirvaniya tikandinê neke

Xwendevan beriya her tiştê sernav û wêneyê dibîne, tişta nûçeyê dide xwendin jî sernav e. Lê ji bo nûçeyê bidî xwendin, dîmen û sernavên cudatî û zayendî bi kar neyîne.

Heke tu nûçeyek lezgîn nadî, lezgîn nenivîsîne. Bi sernavên "BILEZ" zêdekirina "tik"an nexwaze. Ji bo kuştinê gotina "şok", ji bo tûndiya zayendî gotina "çalakiyek kerax", ji bo doza îstîsmara zarokan gotina "doza şermê" bi kar neyîne. Ev feraset, tûndiya sîstematîk weke ku istisna ye nîşan dide, hinek bûyeran li ber çavên civakên derdixe pêş, hinekan jî reş dike. Bi vî awayî tûndiyê jî asayî dike, lewre kuştinên ku "kuştinên şok" bin, ji civakê bertekê nabînin.

"Nêçirvaniya tikandinê" (Click baiting) neke, ango di sernavê de pirsê nepirse û xwendevanan nekişîne ser dafikê. Ûnsûrên di nûçeyên de nîn in, tenê ji bo "tikandinê" di sernavê de bi cih neke. Ev nayê wê wateyê ku "sernavên bi pirs nabin". Lê di bin sernava "Ew hentbolvan li Tirkiyeyê ye" de bi wêneyên taybet ên hentbolvan û partnera wî/ê galeriyek çêneke, an jî sernava te "Li Stenbolê wê berf kengî bibare" be, di nûçeyê de behsa germiyê neke.

Li şûna sernavên bi heqaret, zayendî, homofobîk/transfobîk, cudatî, yên bi baldar û hestyar bibîne.

## Piştî te nûçe nivîsand van pirsan ji xwe bipirse

- Min nûçe bi kîjan nêzikatiyê / ferasetê çêkir?
- Min di nûçeyê de çi kêm hişt? Min çi zêde got?
- Min di nûçeyê de kîjan klîşeyên bi pirsgirêk ji nû ve avakir? Texta nûçeyê gotinên cudatî û nefretê dihewîne?
- Min bi nûçeyê rê li ber binpêkirinek nû vekir?
- Di nûçeyê de ji bo temsîla jin û mêran ez bi têra xwe hevseng û dadwer tev geriyam?
- Min di nûçeyê de cih da bandora wê bûyerê ya li ser jin û LGBTI+yan?
- Dema nêrînên pispor û şahidan girt, min mafê axaftinê da jin û LGBTI+yan?
- Di wêne û grafîkan de tenê mêr û cotên heteroseksuel hene? Min têra xwe curbecuriya zayendî nîşan daye?
- Zimanê min bi kar anî û şêweya nivîsa nûçeyê, wê di nav civakê de xizmeta wekheviyê bike, ango pêşdaraziyên kevneşopî ji nû ve ava dike?
- Wêneyîn min bi kar anî tûndiyê, cudatiyê, hesibandina “yên din” ji nû ve ava dike? Dibe sedema binpêkirinên mafan û mahremiyetê?

## Mînaka nivîsandina nûçeyê

Hûn dikarin li vir du nûçeyan, ku yek derheqê tûndiyê de ye yek jî derheqê çand û hunerê de ye, bibînin. Her wiha hûn dikarin bibînin ku ev nûçe çawa di medyaya gelemperî de cih girtine û wê çawa li gorî zayenda civakî bên nivîsandin.

Me navên di texta nûçeya tûndiyê ya li jêr cih digire de guhertiye. Her wiha me şaşiyên maddî yên derheqê navên di nûçeyê de cih digirin jî wek wê hişt. Ango me dît ku di texta nûçeyek hatiye weşandin de, bi 3 navên cuda behsa heman mirovê tê kirin. Ev nîşan dide ku, beriya pêşkêşkirina nûçeyê ji bo raya giştî divê edîtor û nûçegîhan hîn baldartir bixebitin.

### Nûçeyek kuştinê di medyaya gelemperî de çawa cih girtiye?

Li Maltepeyê bavê ku derûniya wî têk çûbû bi tifinga xwe pêşiyê du qîzên xwe, pişt re jî xwe kuşt. Hate zanîn ku, Mehmet Y yê bi hevsera xwe re li ber cihêbûnê bû û ji hefteyê carekê di bin qontrola polisan de zarokên xwe didît, piştî li ser telefonê bi hevsera xwe re nîqaş kiriye, pêşiyê qîzên xwe, şûn de jî xwe kuştiye.

Dayîk Dilek Yenik, ji bo qîzên xwe yên temamê rojê li cem bavên xwe bûn bigire, çûbû mala hevserê xwe yê doza wan a cihêbûnê berdewam dikir. Dema çûye hundirê malê jî rastî cinazeyên Mustafa Yenik û qîzên wan Ece ya 4 salî û Demir a 2 salî hatiye. Ji ber dayîkê bûyer dîtiye û bi qrîza sînîr ketiye, şêniyên taxê kom bûne.

Piştre liser agahdarkirina şêniyên taxê, gelek polis û komên tenduristiyê çûne wir. Di lêkolîna ewil de, hate diyarkirin ku bav Mehmet Y, berî bi tifinga pompeyî her du qîzên xwe, pişt re jî xwe kuştiye. Dayîk Dilek Yenik a bi qrîza sînîr ketiye,

bi ambûlansê şandine Nexweşxaneya Fatih Sultan Mehmet. Lêkolînên polisan li cihê bûyerê berdewam dikin.

İsmail Çevik xizmê Dilek Yenikê, wiha axifî: "Ji havînê vir de ji bo cihêbûnê kar dikirin. Kesê ku miriye gef dixwar. Çend caran jixwe hatibû desteserkirin jî. Di bin qontrola polisan de destûra dîtina qîzan hebû. Îro jî roja destûrê bû. Li hundir gelek şûşeyên alkolê hene."

Hate zanîn ku, doza cihêbûna Mehmet Yenik û Dilek Yenik ên cihê dijîn 3 meh in berdewam dike, di vê pêvajoyê de jî destûr hatiye dayîn ku zarokên bi dayîka xwe re dijîn hefteyê rojekê li cem bavên xwe bimînin, Mehmet Yenik jî her sêşemê qîzên xwe di bir ba xwe û di mala xwe de bi wan re dem derbas dikir.

Serdozgeriya Komarê ya Anadoluyê ya Stenbolê bi nivîskî ragihand ku, Mehmet Yenikê derûniya wî têk çûbû bi tifingê berê her du qîzên xwe yên 2 û 3 salî ne kuştiye, paşê jî bi heman tifingê xwe kuştiye û derheqê bûyerê de lêpirsîn destpê kiriye.

Daxuyaniya Serdozgeriyê ya derheqê bûyerê de wiha ye:

"Di 02.02.2018an de li Navçeya Maltepeyê, Taxa Fındıklıyê, Kolana Zambakê, dayîka D.Y. a ji ber pirsgirêkên malbatî ji hevserê xwe A. Y. cihê dijî, zarokên xwe E.M.Y. (2014) û M.H.Y. (2015) di bin qontrola polisan de teslîmê A.Y. kiriye. Bav A.Y. piştî li malê alkol vexwariye bi telefonê li hevsera xwe D.Y.yê geriyaye û wan nîqaş kiriye, di encama vê de jî A.Y. cînnet anîye û bi tifinga li malê gule berdaye zarokên xwe yên 2 û 3 salî ne, pişt re jî xwe kuştiye. Hatiye femkirin ku bav û zarok mirine û derheqê bûyerê de lêpirsîn berdewam dike."

### Nûçeyeke derheqê kuştinê de bi feraseta nûçegîhaniya zayenda civakî çawa tê nivîsandin?

Li Stenbolê zilamê bi navê A.Y., bi tifingê 2 qîzen xwe yên di bin qontrola polisan de teslîmê wî kirine kuşt û pişt re jî xwe kuşt.

Derheqê A.Y. ê di merheleya cihêbûnê de bû, hîn berî biryara dûrxistinê hatibû girtin. İsmail Çevik ê malbatê nas dike, ragihand ku A.Y. demeke hevsera xwe tehdît dike.

Hat zanîn ku doza cihêbûnê sê meh in berdewam dike û destûr hatiye dayîn ku di vê pêvajoyê de zarokên bi dayîka xwe re dijîn hefteyê rojek bi bavên xwe re bimînin. Serdozgeriya Komarê ya Anadoluyê ya Stenbolê jî di daxuyaniya xwe ya nivîskî de parast ku A.Y. “cînnet anîye”.

Li gorî çeteleya bianetê, di 2017an de 290 jin hatine kuştin, ji van bûyeran % 19an de piştî kuştinê kujeran xwe kuştine an jî hewldane xwe bikujin.

### Nûçeyek çand û hunerê di medyaya gelemperî de çawa cih girtiye?

69. Xelatên Emmy, li Tiyatroya Microsoftê ya li Los Angelesê bi merasîmekê hatin dayîn. Bername ya pêşkêşvanê wê Stephen Colbert ê xwedî xelata Emmy bû, li ser televîzyona CBS bi zindî hate weşandin. Di şevê de, rêzefîlma “Veep” a HBOyê, di sê salên dawî de 3. Xelata Emmy bi dest xist.

Rêzefîlma “Handmaid’s Tale” a Hulu ku ji fîlma bitansiyon a 1985an de ji aliyê Margaret Atwood ve hatibû kişandin sûd girtiye û nû ve lê hatiye anîn, di beşa dramayê de xelata rêzefîlma herî baş wergirt. Lîstikvan Elisabeth Moss jî ji ber performansa xwe ya di heman rêzefîlmê de, xeleta Lîstikvana Jin a Herî Baş wergirt.

“Saturday Night Live” jî di nav ên qezenckirî de cihê xwe girt. Melissa McCarthy a di vê bernameyê de wek Berdevka Koşka Spî Sean Spicer lîstibû, bu xwedî xelata Lîstikvana Jina Mêvan a Herî Baş.

Ew bi kursiyek dişibiya kursiya axaftinê ya Spicerê ya dema li Koşka Spî dixebitî bi kar dianî derket ser dîkê û ev bû surprîzek şevê.

Rêzefîlma “Game of Thrones”, a HBOyê ku heya îro bi giştî 38 beşan de Xelatên Emmy wergirtiye, ji ber sezona wê dereng destpê kiriye di lîsteya namzetî de cih negirtibû.

## Nûçeyek çand û hunerê bi feraseta nûçegîhaniya zayenda civakî çawa tê nivîsandin?

69. Xelatên Emmy, şeva duh li Tiyatroya Microsoftê ya li Los Angelesê bi merasîmek hatin dayîn. Rêzefîlmên jinan mohra xwe li şevê dan.

Rêzefîlmên jinan mohra xwe li şevê dan. Di çar beşan de (drama, komedî, fîlma TVyê û Rêzefîlma Bisînor) rêzefîlmên xwedî çîrokên jinan xelat wergirtin.

Şeş jinan di kategoriyên xelatên lîstikvanên jin de xelat wergirtin û ji wan çar jin di temenên ser 50yê de bûn.

Derhênera The Handmaid's Tale Reed Morano, di Beşa Dramayê de Xelata Derhênera/ê Herî Baş wergirt û bi vê awayê serkeftî bû ku di sîwana cam a qada derhêneran a Emmy de şikestiyek çêkir.

Rêzefîlma The Handmaid's Tale, a ku ji romana dîstopîk a Margaret Atwood ji bo televîzyonê hatibû adaptekirin, tevî Xelata Dramaya Herî Baş, bi giştî heşt xelat bi dest xist. Nivîskara Femînîst Margaret Atwood derket ser dîka Emmy. Lîstikvanên jin di axaftinên xwe de spasiyên xwe ji Atwood anîn ziman.

Big Little Lies, a ku çîroka tûndiya nav malê û piştgiriya jinan vedigotîne û çêkirina wê bi temamî aîdê jinan e, bi tevî Xelata Rêzefîlma Bisînor, bi giştî heşt xelat wergirt. Nicole Kidman, a ku bi rola xwe ya di vê rêzefîlmê de di Beşa Rêzefîlma Bisînor de Xelata Lîstikvana Jin a Herî Baş wergirt, wiha axifî: "Me tûndiya nav malê ronî kir. Ev nexweşiyek komplike û ker e. Ji qasî em dixwazin hîn zêdetir kurahiya wê heye. Bi şerm û weşartiyê tijî ye û ev xelata ji bo min hatiye dayîn, wê hîn zêdetir vê mijarê ronî bike."

Nivîskara Master of None ya Netflixê Lena Waithe, Xelata Senaryoya Komediyê ya Herî Baş wergirt û di beşa nivîskariya komediyê de bû jina yekem a reş (û kuir) a vê xelatê bi dest xistiye.

Gorî daneyên Women's Media Centerê (WMC), kesên di 2017an de ji bo Emmy wek namzet hatine nişandan % 72 zilam, % 28 jî jin bûn.

## Analîzên nûçeyan

### Adar 2013 – Homofobî na mafên zarokan

Di 21 Adar 2013an de Serokwezîrê Demê Recep Tayyip Erdoğan, di serdana Hollandayê de bi Serokwezîrê Hollandayê Mark Rutte re civînek çapameniyê li dar xist. Erdoğan eşkere kir ku, wî xwestiye zarokê bi navê Yunus, ê ji malbatek Tirkiyeyî girtine û dane cotek lezbiyen, "îadeyê" malbata wî ya biyolojik bikin.

Ev daxuyanî di televîzyon û rojnameyan de bi sernavên wek "Erdoğan Yunus pirs kir: Ji malbata wî girtin û welayeta wî dan cotek lezbiyen" bû nûçe. Piştî van nûçeyan, nûçeyên bi manşetên wek "Yunus bigirin!" û "Wê Yunus ji malbata lezbiyen bê rizgarkirin" hatin çêkirin.

Gorî nûçeyan, hikûmeta Tirkiyeyê, "ji bo 5 hezar zarokên Tirk ên li welatên Ewrûpayê bi hincetên cuda ji malbatên wan girtine û dane malbatên Xirîstiyan ketiye nav liv û tevgerê" û "ji cotên hevezayend dest bi kar kiriye."

Dîsa gorî heman nûçeyan, Yunusê 9 salî, dema 5 mehî bûye (ango 8,5 berî) milên wî şikestiye, serê wî werimîye, loma birine nexweşxaneyê û ji ber vê sedemê jî rayedarên Hollandayê wî ji malbatê girtine. Ji ber heman sedemê xwestine du zarokên malbatê yên din jî bigirin, lê malbatê zarokên xwe aniye Tirkiyeyê û wisa nehiştiye bigirin.

Erdoğan, wiha diaxifî: "Heke Misilman e bidin malbatek Misilman.", "Zarokek teslîmê malbatek hevezayend bikî, ev ji ber

rêzikên exlaqî û bawerî ne rast e. Em mecbûr in ku emanetê teslîmê destên bibawer bikin. Alîkarê Serokwezîrê Hollandayê Lodewijk Asscher jî wiha digot: “Em hilbijartina malbatên hîmander gorî nîjadan nakin. Şûna vê em dixwazin bawer bibin ku zarok di destên bibawer de ye.”

Mijar demek dirêj di rojevê de ma, nûçe hatin çêkirin. Hate eşkerekirin ku, komîsyona Meclîsê dest bi lêkolînê kiriye, ji bo lêkolînê 17 Avrêlê ji Elmanyayê destpê dike û hinek welatan din jî lêkolîn berdewam dike û wê pişt re jî raporek amade bike.”

Xizmetên civakî, ji ber hatina Erdoğan, malbata hîmander a Yunus di xaniyek din a navnîşana wê nayê zanîn de bi cih kir.

## Medyaya gelemperî çawa kir nûçe?

Di medyeya gelemperî de bûyer bi van sernav û gotinan bû nûçe:

“Cota Lezbiyen Yunus veşart”, “Yunusê ji malbata wî girtin û dan malbata lezbiyen”, “ji aliyê cota lezbiyen a bi wan re dijî ve di navnîşanek nayê zanîn de tê veşartin”,* “cota lezbiyen diltirs in!”, “Cota lezbiyen a Hollandayî ji ber Erdoğan reviyan”, “Cota lezbiyen bûn sir!”, “Dayîka wî bi hesret hêviya wî ye, lê…”, “Operasyona rizgarkirina Yunus ji cota lezbiyen”, “ji ber dayîk Nurgül Azeroğlu bi hinceta zimanê Hollandayê nizane malbatê nikaribû Yunus bigirta”, “Dibin dêrê”, “Xwûşk û birayên wê jî hatibûn girtin”.

Zimanê tê bikaranîn, “yên din” ava dike û dike cinawir. Gotinên zayendî yên dualî û cudatiya di daxuyaniyan de hene, bi nûçeyan têne rewakirin û nû ve têne avakirin. Du mirovên li zarokek di bin sîwana saziya xizmeta civakî de xwedî derketine, wek zarok dizîne û bê xwesteka wî û derveyî qanûnan wî radestkirine hatine nîşandin, tercîhên wan ê zayendî bi awayek cudatî hatiye diyarkirin û bi vê awayê hatiye xwestin ku li hemberî wan hêstên şermî bên avakirin.

Rastî tên veşartin, agahî tên manîpulekirin. Di nûçeyan de rastiya 8,5 sal in zarokê 9 salî bi malbata xwe re nîn e û bi cota lezbiyen ya kirine cinawir re ji malbata xwe ya biyolojîk zêdetir dem jiyaye tê veşartin. Yunus û dayîkên wî ji aliyê xizmetên civakî ve li navnîşaneyek veşartî hatine bicihkirin, lê di nûçeyan de wek ""ji aliyê cota lezbiyen a bi wan re dijî ve di navnîşanek nayê zanîn de tê veşartin" cih girtiye.

## Bianet çawa kir nûçe?

Di nûçeyê de hatiye nîqaşkirin ku, zarokek 9 salî, ku 8.5 sal in bi dayîken xwe re dijî, dema tê xwestin ku wek lîstokek ji dayîkên wî bê girtin, wê ji aliyê derûniya zarokan ve çi qasî tiştek rast û baş be. Psîkiyatrîstek û du parlamenterên endamên Komîsyona Mafên Mirovan a Meclîsê bûyera qewimiye di çarçoveya derûniya zarokan, mafên zarokan û cudatiya hemberî LGBTI+yan de nirxandin.

Medyaya gelemperî, LGBTI+yan di navenda bûyerê de bi cih kiribû. Ku bûyer di medyaya gelemperî de bi zimanek avakirina "yên din" û cudatî bibû nûçe. Lê kirdeya bûyerê, zarokek e, ku tê gotin malbata wî lê xirab muamele kiriye, xizmeta xwedîkirinê têr negirtiye û di bin parastina saziya xizmeta civakî de ye. Loma bianet vê nûçeyê di çarçoveya nûçegîhaniya mafan a zarokan de nirxand.

**Nîqaş çima dayîna cota hevezayend nîn e, çima ji malbatê hatiye girtin e** **(Sibat 2013, bianet)**

"Pirsa herî girîng ya li vir, zarok çima ji malbata wî ya biyolojîk hatiye girtin e. Heke ev zarok di neh saliya xwe de malbat biguhere, diçe ku bila biçe, wê rê li ber pirsgirêkên gelek ciddî vebike."

## Adar 2018 – Ne Fantezî, Tûndî

Di Adara 2018an de ajansek nûçeyan a netewî nûçeyek weşand û ragihand ku li bajarek jinek ji ber li ser zilamek tûndî bi kar anîbû piştî du salan di zindanê de mabû hate berdan, ku

wî zilamê hevaltiyê teklîf kiriye û dema bersiva neyînî girtiye jî jinan tacîz kiriye. Bûyer, li ser malperên herêmî yên nûçeyan de wek “Doza Fanteziyê” bû nûçe.

## Çi bibû?

Gorî nûçeya ajansê, zilamek, ku zewiciye, bavê sê zarokan e û karkerê avahiyan e, dema jina zewiciye û diya zarokek e teklîfa wî red dike, bi tehdîtan dixwaze wê bibîne; di 13ê Kanûn 2016an de tên cem hev.

Di nûçeyê de derheqê dema hevdîtinê çi bûye agahî tune. Lê hate ragihandin ku, jinê bi gotina “em fantezî bikin” zilam xapandiye, piştre zilam girêdaye, li zilam xistiye û cihê bûyerê terikandiye.

Roja din jin û çar xizmên wê hatin radestkirin. Jin bi sûcdarkirina “Bi planî hewldana kuştinê”, du xizmên wê jî bi sûcdarkirina “alîkariya bi planî hewldana kuştinê” hatin girtin. Du xizmên din ên hatibûn radestkirin jî bi şerta serbestberdana bin qontrolê de hatin berdan. Her du xizmên hatibûn girtin piştî 26 rojan ji zindanê hatin berdan.

## Medyaya herêmî çawa kir nûçe?

Bûyer di medyayê de wek “doza fanteziye” hate zanîn. Gorî nûçeyan, di navbera zilam û jinê de, ku her du jî bi kesên cuda re zewicî ne, demên borî de têkiliyek hebûye û ew jî “eşqa qedexe” bûye. Her wiha gorî nûçeyan, jinê xwestiye dev ji zilam berbide, lê zilamê vê nexwestiye û jinê tehdît kiriye û parêzer jî gotiye ku ev jin demek e rastî tacîza sîstematîk hatiye.

Tevî van hemû agahiyan lê dîsa jî di nûçeyê de gotinên wek “jina ku bi gotina ‘bila fantezî be’ zilam xapandiye, girêdaye û lêxistiye hate berdan” cih girtiye. Wekî din, di qanûnan de xala sûcê ya “hewldana kuştinê” wek “hewldana kuştina zilam” hatiye nivîsandin.

Di nûçeyê de agahiya derheqê zilam jinê tehdît û tacîz kiriye derneketiye pêş, lê di sernavên navber de gotinên wek “li bavê 3 zarokan xist”, “Got, em fantezî bikin” hate bikaranîn.”

## Bianetê çawa kir nûçe?

Bianetê cih da daneyên berbiçav û wiha bûyerê kurtasî kir. Her wiha ji bo xwendevanan rexneyek medyayê weşand. Bal kişand ser zimanê cudatiyê yê nûçeyên di medyaya herêmî de cih girtine. Her wiha bal kişand ser nûçeyên li dijî jin û LGBTI+yan cudatiyê xurt dikin yên heman ajansê û heman rojnameyên herêmî yên demên borî de hatibûn weşandin û bi vê awayî ji bîr anî ku ev pirsgirêkek sîstematîk e.

**Medyayê ji Tûndiyê “Fantezî” Derxist** **(Adar 2018, bianet)**

Jina li ser zilamê wê tehdît û tacîz kiribû tûndî bi kar anîbû, piştî du salan ji zindanê hate berdan. Jin, ji ber rizgar bibe zilam girêdabû û ji cihê bûyerê dûr ketibû, lê ev di medyayê de wek “doza fanteziye” cih girtibû.

# Ceribandinên ji navenda nûçeyan a bianetê

**Murat Bayram:**

**Bê bikaranîna gotinên cudatî, em bi Kurdî çawa dibêjin "kerxane"?**

Pirsa nûçeyên kerxaneyê wê çawa bi Kurdî bê nivîsandin / ji bo Kurdî bê wergerandin, sihebek wek pirsek mejûyê min bloke kir derket hemberî min. Kerxane bi du referansan tê gotin. Ker di Kurdî de ker e (Tirkî eşek). Xane jî cih e. Gorî referansa duyem jî ker (ker, navê kar ê hatiye guherîn), tê wateya cihê kar, hîn rastir cihê "kar tê kirin". Di nav civakê de ker (Tirkî eşek) ji bo piçûkxistina mirovên li wir dihat bikaranîn, dîtina kesên wek "kar pê tê kirin" jî, wan kesan dike meta / tişt.

Me xwest ku bi edîtorên Tirkî re çareseriyek bo vê tiştê bibînin.

Min "seksxane" (ango cihê seksê an jî cihê seks tê kirin) pêşniyar kir û edîtoran jî pêşniyar kirin ku pirsporên civaka sivîl ên li ser vê qadê dixebin gelo ji bo vê pênasekirinê çi dibîjin, divê bê kontrolkirin. Serokê Komeleya Baranparêza (Şemsiye) Sor Kemal Ördek, got ku, ev wate rast e û pêşniyar kir di wergerê de bê diyarkirin ku ev cih bi pere ne. Wiha me jî di wergera Kurdî de peyva kerxaneyê wek "Seksxaneyên Pereyî" wergerand.

**Jinên dersdêr hene**

Di Kurdî de mam tenê bo birayên bav na, her wiha ji bo zilamên temenên xwe mezin in jî wek di wateya rêzgirtinê de tê bi kar anîn. (Tirkî heman tişt heye.)

Ji ber ku kesên perwerdeh didin ên Kurd piranî zilam in, ji mamên hosta ne re gotine "mamhosta/mamosta".

Di medreseyan de (cihê perwerdeha olî didin) peyva koka xwe ji Erebî digire ya "seyda" ji bo mamoste/dersdêr dihat bikaranîn. Min jî ji seydayên jin perwerdeha Qur'anê dîtiye

û me ji wan re digot seyda. Lê li cihê perwerdeha olî nebû, ji peyva seyda ditirsiyan, wiha jî peyva mamosta cihê dersdêr girt. Lê her çi qasî di Kurdî de bi gelemperî neyê bikaranîn jî, peyva "dersdêr" (yê/a ders dide) a referansa xwe ya zayendî nîn e hebû.

Bianet/Kurdî peyva dersdêr tercîh kir.

**Dema em dibêjin îstîsmara zarokan em çi derdixin pêş?**

Di nav "Kêrteya Tûndiya Zilam" a bianet her meh amade dike de beşa îstîstamar zarokan heye. Dema me behsa zarokên keç / qîz dikir, ev dibû pirsgirêkek cuda. Di Kurdî de dema dibêjin "zaroka keç" zarok derdikeve pêş, lê dikaranîna "keça zarok" de keç derdikev pêş. Ji ber vê, dema îstîsmara zarokan tê gotin, zarok derkive pêş û her wiha mexdûr wek zarok tê diyarkirin, loma jî me gotina "zaroka keç" tercîh kir.

## Elif Akgül:

**Kadın gazeteciler mi, gazeteci kadınlar mı?**

Haberleri yazarken haberde bahsi geçen avukat, hakim, gazeteci, vb. erkek olduğunda mesleğinin önünde cinsiyetini belirtmiyoruz. Ama kişi kadın olduğunda hemen "kadın avukat, kadın hakim, kadın gazeteci" oluverir, tıpkı "erkek hemşire", "erkek hastabakıcı" gibi.

bianet'te gazeteci kadınlarla ilgili bir haber hazırlarken sürekli kullandığımız "kadın gazeteciler" kalıbına aklımız takıldı. Amacımızın kadınların mesleği mi, yoksa o mesleği yapan kadınlar mı olduğunu tartıştık. Bu sorunun tek bir cevabı yok. Ama şöyle bir formül bulduk. Eğer bir meslek içindeki farklı cinsiyetlere yönelik farklı bulguları paylaşacaksak ve derdimiz cinsiyetler arasındaki uçuruma işaret etmekse, dolayısıyla vurgumuz kişinin cinsiyetineyse "kadın gazeteci" gibi cinsiyet kimliğini önce yazıyoruz.

Örn: “Kadın gazeteciler, erkek gazetecilerle aynı maaşı almadıkları için greve gidiyor”.
Eğer bir bir kişinin başına mesleği nedeniyle bir olay geldiyse, dolayısıyla mesleğine vurgu yaparken okuyucuyu kişinin cinsiyetiyle ilgili olarak da bilgilendirmek istiyorsak önce mesleği yazıyor, vurguyu mesleğe yapıyoruz.

Örn: “Gazeteci kadınlar, grevdeki matbaacı kadınlara destek ziyaretinde bulundu”.

Yani vurgumuz mesleğe ise önce mesleği, cinsiyete ise önce cinsiyeti yazıyoruz.

**Ekin Karaca:**

Piştî karsaz Osman Kavala hatibû radestkirin, hevsera wî Prof. Dr. Ayşe Buğra bo çapameniyê daxuyaniyek belav kiribû. Dema min vê daxuyaniyê kir nûçe, di serî de wiha nivîsandibû: “Hevsera Osman Kavala ya ji Zaningeha Boğaziçiyê Prof. Dr. Ayşe Buğra...”

Pişt re bi vê awayê çima min Ayşe Buğrayê berî herî tiştê wek “hevsera Kavala” diyar kiribû, bû sedema pirsan. Min hevokê wiha guhert: “Erkedara hîndekariyê ya Zaningeha Boğaziçiyê Prof. Dr. Aşye Buğra, derheqê lêpirsîna hevserê xwe Osman Kavala de daxuyaniyek nivîskî belav kir.” Pêwîst e em bizanibin ku qalibên tên zanîn dibe zayendî bin û em rê û rêbazên nû ava bikin, derbikevin derveyî van qaliban û wiha nûçeyan binivîsînin.

## WEŞANÊN WEQFA RAGIHANDINÊ YA IPSYÊ

Hûn dikarin kopyayên elektronîk yên weşanên me li navnîşana bianet.org bibînin.




**03-05KASIM 2006**

**İSTANBUL / ULUSLARARASI BAĞIMSIZ MEDYA FORUMU**

Hazırlayan: Sevilay Çelenk

**BAŞKA BİR İLETİŞİM MÜMKÜN**
**BİLDİRİLER**

**IPS İLETİŞİM VAKFI YAYINLARI**




**HABERCİNİN EL KİTABI**

Derleyen: Sevda Alankuş


**GAZETECİLİK HABERCİLİK**

* Çiler Dursun * Ragıp Duran * İncilay Cangöz

* Esra Arsan * Tuğrul Eryılmaz

* Özcan Yurdalan * Mehmet Sucu

**IPS İLETİŞİM VAKFI YAYINLARI**





**HABERCİNİN EL KİTABI**

Derleyen: Sevda Alankuş

**MEDYA ETİK VE HUKUK**

* Süleyman İrvan * Ragıp Duran * Fikret İlkiz

**IPS İLETİŞİM VAKFI YAYINLARI**




**HABERCİNİN EL KİTABI**

Derleyen: Sevda Alankuş


**RADYO VE RADYOCULUK**

* Nilüfer Timisi Nalçaoğlu * Tuğrul Eryılmaz

* Ragıp Duran * İpek Çalışlar * Beybin D. Kejanlıoğlu

* Erol Önderoğlu  * Ülkü Giray

**IPS İLETİŞİM VAKFI YAYINLARI**




**HABERCİNİN EL KİTABI**

Derleyen: Sevda Alankuş

**MEDYA VE TOPLUM**

* Halil Nalçaoğlu * Ayşe İnal * Mine Gencel Bek

* Beybin D. Kejanlıoğlu * Sevda Alankuş

* Nilgün Gürkan Pazarcı

**IPS İLETİŞİM VAKFI YAYINLARI**




**HAK HABERCİLİĞİ DİZİSİ**

Hazırlayan: Sevda Alankuş

**KADIN ODAKLI HABERCİLİK**

* Filiz Kerestecioğlu * Hülya Gülbahar * Eser Köker
* Hülya Uğur Tanrıöver * Nadire Mater * Selen Doğan
* İpek Çalışlar * Burçin Belge * Beyhan Demir

**IPS İLETİŞİM VAKFI YAYINLARI**





**HAK HABERCİLİĞİ DİZİSİ**

Hazırlayan: Sevda Alankuş

**ÇOCUK ODAKLI HABERCİLİK**

* Yasemin Onat * Seda Akço * Serdar Değirmenoğlu
* Gülgün Erdoğan Tosun * İncilay Cangöz
* Erhan Üstündağ * Kemal Özmen * Ahmet Şık
* Ragıp Duran * Ezg, Koma * Sema Hoşta

**IPS İLETİŞİM VAKFI YAYINLARI**




**HAK HABERCİLİĞİ DİZİSİ**

Hazırlayan: Sevda Alankuş

**İNSAN HAKLARI HABERCİLİĞİ**

* Levent Köker * Gülgün Erdoğan Tosun
* Çiler Dursun * Yıldız Samer * Tolga Korkut
* Oğuz Haksever * Şerif Erol * Hüsnü Öndül
* Peter Mcıntyre

**IPS İLETİŞİM VAKFI YAYINLARI**




**YENİ HABERCİNİN ELKİTABI**

Hazırlayan: Sevda Alankuş

**GAZETECİLİĞE BAŞLARKEN**
**OKULDAN HABER ODASINA**

Sevda Alankuş * Umur Talu * İncilay Cangöz
* Yavuz Önen * Hüsnü Öndül * Gülgün Erdoğan Tosun
* Özden Çankaya * Murat Çelikkan * Tolga Korkut
* Erhan Üstündağ * Ertuğrul Kürkçü * İpek Çalışlar
* Mete Çubukçu * Ragıp Duran * Ahmet Tulgar
* Rana Yılmaz * Nurcan Akad * Füsun Özbilgen
* Altan Öymen * Tuğrul Eryılmaz * Murat Utku

**IPS İLETİŞİM VAKFI YAYINLARI**




**HAK SAVUNUCUSUNUN ELKİTABI**

Hazırlayan: Gülgün Erdoğan Tosun

**HAK ÖRGÜTLERİ MEDYADA GÖRÜNÜR OLMAK**

* Sevda Alankuş * Gülgün Erdoğan Tosun
* Fügen Uğur Ergun Gümrah * Sinan Gökçen
* Erol Önderoğlu

**IPS İLETİŞİM VAKFI YAYINLARI**





**HABERCİNİN EL KİTABI**

Hazırlayan: Sevda Alankuş

**YENİ İLETİŞİM TEKNOLOJİLERİ VE MEDYA**

* Ümit Atabek * S. Hakan Tuncel * Hakan Kara
* Murad Karaduman * Nihat Halıcı

**IPS İLETİŞİM VAKFI YAYINLARI**




**İFADE ÖZGÜRLÜĞÜNÜN ON YILI 2001-2011**

Emek Çaylı ve Gülsüm Depeli

Fikret İlkiz ve  Erol Önderoğlu'nun katkılarıyla

**IPS İLETİŞİM VAKFI YAYINLARI**




**BARIŞ GAZETECİLİĞİ ELKİTABI**

Yazar: Sevda Alankuş

**IPS İLETİŞİM VAKFI YAYINLARI**

Destepirtûka Nûçegihaniya Zayenda Civakî, pirtûka me ya Nûçegihaniya Jinan temam dike. Vê carê sînorê xwe tenê bi jinan diyar nake, her wiha li ser binpêkirinên mafan yên di nûçeyên derheqê LGBTI+yan de jî radiweste. Kesên nasnameyên zayendî yên cuda temsîl dikin çawa dibin mijara nûçegîhaniya mafan? Ji bo vê ev pirtûk, di çarçoveya ceribandinên bianetê û hevkarê me yê projeyê KaosGLyê rehberek pêşkêş dike. Ji aliyê din ve ev pirtûk, wek berdewama Destepirtûka Nûçegihaniya Aşitiyê ye. Em di demek wiha de ne ku tûndiya li ser jinan û hemû “yên din” her diçe zêde dibe. Ji bo aşitiyek dadwer, berî her tiştê pêwîstiya me bi nûçegîhaniya zayenda civakî, loma jî ji her demê zêdetir bi rehberek heye.

Sevda Alankuş